Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal de


Hejmar: 91
15'ê Tîrmehê
Buha: 150 Tûmen

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

Dr. Îsmaîl Beşîkçî:
**"DR. QASİMLO RONAKBÎR Û ABORÎNASEKE HÊJA BÛ"**
Di R.4'an ya Paşkoyê de



**Peyama Mistefa Hicrî Derheq...**



2

**Beşdariya Şanda PDK Îranê Di 23'hemîn Kongireya ES'ê De**



3

**Bizava Neteweyî A Kurd Ji Nêrîna Dîroka Siyasî Ve**




5

**Jinên Birîndar Ên Kîmyabarana Bajarê Serdeştê**




7

**Hîndekarî**



9

**Mîr Celadet Elî Bedirxan**



10

**Di 19'hemîn Salvegera Şehîdên Viyenê De:**

# LÎ KURDİSTANA ÎRANÊ GİREVA GİŞTÎ HATE LİDARXİSTİN

Bi hinceta 19'hemîn salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo û Ebdula Qadirî Azer li ser maseya gotûbêjê, bi destê dîplomat terorîstên rejîma Xomêynî, xelkê bajarên Kurdistana Îranê li ser bangewaza PDK Îranê, gireveke giştî bona nîşandana nerazîbûnê bi awayekî girseyî û berfireh lidar xistin. Bi vî awayî gelê Kurd nerazîbûna xwe ya sivîl û aştiyane li hember siyaseta terorîstî a vê rejîma kevneperest dan xuyakirin.

Serbarê daxistina dikan û bazaran, di roja 22'ê Pûşperê, salvegera vê cinayetê, xelkê Kurdistanê seet 22'ê şeva wê rojê jî bo dema 3 deqîqeyan çirayên malê xwe temirandin û êvariya wê rojê jî bi kincên Kurdî daketin ser rê û şeqaman.

**Nûçeyên berfireh di**



Dr. Qasimlo û Ebdula Qadirî

## 19'hemîn Salvegera Şehîdkirina Dr. Qasimlo Û Hevalê Wî, Di Rê Û Resmeke Hêja Û Berfereh De Hate Bibîranîn

Bi hinceta 19'hemîn salvegera terorkirina **Dr. Ebdulrehman Qasimlo** û **Ebdula Qadirî Azer**, li ser maseya gotûbêjê, ji aliyê terorîstên rejîma Îranê, roja 22'ê Pûşperê(12.07.2008), rê û resmeke girse û berfireh di hola giştî a civînên PDK Îranê de bi beşdariya endamên rêberiya Partiya Demokrat, nûnerên partiyên siyasî û hejmareke zaf ji Kadro û Pêşmerge û malbatên wan ve birêve çû.



Rê û resm bi xwendina sirûda neteweyî a "Ey Reqîb" û deqîqeyek bêdengî bona rêzgirtin bo canê paqij yê Şehîdên Kurdistanê dest pê kir.

Piştre **Mihemednezîf Qadirî**, endamê Deftera Siyasî a PDK Îranê, peyama Deftera Siyasî a partiyê bi vê hincetê pêşkêş kir. Deqa peyama Deftera Siyasî a PDK Îranê di vê hejmara Agirî de ketiye ber çavê we xwendevanên hêja.

Di beşa din a rê û resma 22'ê Pûşperê de, çend sirûd, helbest û pexşanên taybet bi vê hincetê hatin pêkêşkirin.

Herwiha peyama Partiya Sosyalîst a Kurdistanê ji aliyê birêz **Nûredîn Agirî** û peyama hevbeş a Yekîtiya Jin û Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê bi vê hincetê ve hate pêşkêşkirin.

# Peyama Birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê Ji Bo 23'hemîn Kongireya Enternasyonala Sosyalîst

**Cenabê Serok!**
**Gelî rêzdaran!**

Ez xwe bi bextewer dizanim ku ev derfete ji min re pêk hat ku bas li dabînkirina demokrasiyekê bikim ku dubendî û nakokiya navbera neteweyan ji nav dibe û biratî û bi hev re jiyana hemdem di nava wan de misoger dike. Neteweya me, anko Kurd bi giştî, neteweya herî mezin a bêdewlet û bindest ya Rojhilata Navîn e û di heyamê nêzîk du sedsalên borî de, ji bo dabînkirin û cihgirkirina demokrasî û mafê neteweyî li dijî dîktatoriyê xebat û berxwedan kiriye. Di rêya wê armancê de xaka me hatiye şewitandin, xelkê me bikom hatiye kuştin û qirkirin û em ji mafên herî destpêkî ên mirov ku xwendin bi zimanê Zikmakî ye, hatine bêparkirin. Ji bo ku meremên min baştir rohn û zelal bibin, rêyê bidin min bila ez li ser çawaniya liv û lebat û bîrkirina hikûmeta Komara Îslamî ya Îranê tevî gelê Kurd di Kurdistana Îranê de bas bikim ku xebat û tekoşîna siyasî ya partiya me di wî parçeyî de ye:

Her ji rojên destpêkîn ên hatine serkara desthilata wê rejîmê ve, partiya me, PDK Îranê, bi alîkariya komek ji partiyên siyasî ên din yên Kurdistanî, bi armanca peydakirina çareseriya aştîxwazane a pirsa Kurd di wî welatî de, ji hikûmetê re pêşniyara gotûbêjan kirin, lê wan di bersivê de, piştî hederdana salek demê, çaxekê ku leşkerê berfireh yê xwe organîze kir, partiyên siyasî yên Kurdistanî îlegal îlan kirin û êrîş kirin ser Kurdistanê û heta Xomeynî Fetwaya Cîhad li dijî gelê Kurd ragihand. Ev rewşa kambax û xirab li Kurdistanê heta niha jî dom dike.

Di vê heyamê de bi hezaran kes ji xebatkarên Kurd nemaze tekoşerên PDK Îranê li hundir û derveyî welat hatine şehîdkirin yan terorkirin, ku **Dr. Ebdulrehman Qasimlo** û **Dr. Sadiq Şerefkendî** di rêza wan xebatkaran de ne.



Niha hêzên rejîmê weke axeke dagirkirî bi Kurdistanê re tevdigerin. Siyaseta rejîma Komara Îslamî ewa ye ku bi zora çewisandin û tund û tûjiyê, xwesteka demokrasiyê û mafê neteweyî yê wî gelî serkut bike, ji ber ku ew li ser vê baweriyê ne ku xurtbûna her tevgereke azadîxwazane dibe sedema parçeparçebûn û ji hev belavbûna Îranê, lewra jî xebatkarên me û neteweyên din yên Îranê bi cudaxwaz dihesibînin û li gor vê yekê jî bi awayekî bêrehmane cezayan bi ser wan disepînin. Her niha bi dehan kes ji xebatkarên partiya me di girtîgehên Komara Îslamî de ne.

Tenê di 6 mehên borî de, 42 kes ji welatiyên Kurd bi awayên cur bi cur ji aliyê rejîmê ve hatine kuştin û bi sedan kes hatine zîndanîkirin, lîsteya cinayetên rejîmê ku di 6 mehên borî de rêve çûne, li ber destê we de ye.

Ewa ku min bi kurt û kinî li ser Kurdistanê bas kir, tenê weke nimûneyekê ye û rewşa neteweyên din ên Îranê jî bi ferq û cudahiyeke kêmtir her bi vî awayî ye.

Meşandina vê siyasetê di heyamê 30 salên borî de, ê bûye sedema vê çendê ku roj bi rojê berxwedana xelkê tevî rejîmê xurt û zêdetir bibe û rejîm jî bêrehmanetir xelkê qir û serkut bike. Bi awayekê ku niha rejîm xebat û berxwedana Jinan, Kedkaran, Mamostayan û tex û qatên din ên civakê ku tenê ji bo mafê sinfî yên xwe dixebitin, gellek bi tundî diperçiqîne, tepeser dike.

PDK Îranê ku ceribîna zêdetirî 60 salan xebat û berxwedan li dijî dîktatorî û dabînkirina demokrasiyê di Îranê de heye, li ser vê baweriyê ye ku tenê rêya pêkve jiyana aştiyane a neteweyên cuda di welateke pirrnetewe weke Îranê de, misogerbûna hemû mafên demokratîk û neteweyî ên wan e û eva jî tenê bi avakirinek sîstemek demokratîk a Federal di Îranê de tê holê. Bi awayekê ku her gelekê li ser axa xwe desthilata xwecih ji bo birêvebirina xwe hebe û li gor qanûnan jî di rêvebirina giştî a welat de beşdar be.

Ji bo bidestveanîna vê daxwazê, partiya me bi alîkariya 15 partî û rêxistinên din ji tev neteweyên Îranê, eniyek bi navê **Kongireya Neteweyên Îrana Federal** pêk aniye û bi hev re dixebitin.

**Hevalino!**

Heke guhartina hikûmeta Komara Îslamî a Îranê bi hikûmeteke demokratîk, xwesteka hemû gelên Îranê û civaka navneteweyî ye, tekoşîn ji bo bidestxistina vê meremê jî hewceyî bi alîkariya tev aliyan heye. Lê mixabin azadîxwazên Îranê di wê qada berxwedanê de bi tenê mane, renge ew nekarin bo demeke dûr û dirêj li hember serkutkirina hovane û çewisandina ji aliyê rejîmê ve, xebatê bidomînin û tirsa vê yekê heye ku di berxwedanê de bêhêvî bibin. Ewa di halekê de ye ku dengê nerazî yê civata navneteweyî li dijî Îranê, zêdetir bi hewl û xebatên rejîmê ji bo meyandina Uraniyûmê bi armanca bidestxistina çeka Etomî hatiye girêdan û herwiha gefên wê rejîmê ji welatên deverê.


Pirsa me li vir ewa ye ku: Gelo heke rejîma Komara Îslamî a Îranê dest ji zaxkirina Uraniyûmê berde û gefê ji welatên herêmê neke, wê demê civata navneteweyî dê jê razî be û xelat bike? Di rewşeke wilo de, êdî destê dewleta Îslamî a Îranê li serkut û zordariyê derheq azadîxwazan û gelên Îranê dê valatir û vekirîtir bibe û bêtirstir dê wan bikuje û tepeser bike.

Komara Îslamî a Îranê bi xurt û berfirehkirina terorê, pêkanîna ne ewlehî di herêmê de û cihgirkirina dîktatoriya Olî a weke xwe ji bo welatên din ên cîhanê, hemû karîn û şiyana madî û olî a xwe yê xistiye holê, alîkariyên herî mezin dide hikûmet û girûpên Fendemêntalîst ên navçeyê û hemû bi hev re bi serokatî û hevkariya Îranê, astengeke mezin li hember berbipêşdeçûna demokrasiyê û tenahiyê di herêmê de çê kiriye û heta niha serkevtin jî bidest xistine.

Li hember wê eniya xurt û cihê tirsê de, hikûmet û rêxistinên demokratîk ên welatên cîhanê, ji bo bihêzkirina demokrasiyê, têkşikandina van kosp û astengane û piştgirî ji hêzên demokratxwaz ên Îranê û deverê çi kirine?

Em hêvîdar in ku heta ji vê derengtir nebûye û xeter û gefên rejîma Komara Îslamî ya Îranê ji vê çendê zêdetir nebûne, ji bo vê kaos û dêvzimeyê çareseriyek bihê peydakirin ku roj bi roj zêdetir pelan davêje û bihêztir dibe.

**Mistefa Hicrî**
**Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê**



www.arsivakurd.org

# Şandeke Payebilind Ya PDK Îranê Di 23'hemîn Kongireya Enternasyonala Sosyalîst De Beşdarî Kir

Şandeke payebilind a PDK Îranê bi serokatiya Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê vê partiyê, beşdarî 23'hemîn kongireya Enternasyonala Sosyalîst bû ku li welatê Yûnanê de hate lidarxistin.

Di saziya Enternasyonala Sosyalîst de, 170 partî û sazî endam in û saziya han piştî Rêxistina Neteweyên Hevgirtî, mezintirîn û berfirehtirîn Rêxistina navneteweyî ye ku xwediyê statûya ravêjkarî di vê saziyê de ye.

Xebatên 23'hemîn kongireya "SI"ê tevî mêvandariya Partiya Sosyalîst a Yûnanê, (PASOK) roja 30.06.2008'an, li Atena paytextê Yûnanê de, dest pê kir.




Dîmenek ji şanda PDK Îranê di 23'hemîn Kongireya "SI"yê

**Şirovekirina pirsên cîhanî di roja yekem a kongireyê de**

Kongireya han roja 30.06.2008'an, bi axavtinên **Yorgo Papandru**, Serokê Enternasyonala Sosyalîst bi fermî dest bi karê xwe kir.

Navhatî di axavtinên xwe de piştî bixêrhatinkirina şandên beşdar di kongirê de, li ser pirsên bingehîn ên cîhanê yên weke germbûna hewa û encamên wê, xizanî, kêmbûn û giraniya hewcehiyên xwerinê, binpê kirina mafê mirovan û demokrasiyê axivî.

Di beşa duyem a pirogramên roja yekem a kongireyê de ku bona jordebirina pileya endambûna hejmarek ji partiyên endam û her wiha şirovekirina daxwazên hin partî û saziyan bona endambûn di vê saziyê de, hatibû terxankirin, PDK Îranê weke endamê Ravêjkar a vê saziyê hate diyarîkirin.

Her wiha di vê beşê de, **Yorgo Papandru** û Lûyîs Ayala bi piraniya dengan weke Serok û Sekreterê Giştî yê Enternasyonala Sosyalîst hatin hilbjartin.

**Şirovekirina pirsa aştî û demokrasî di beşa yekem a karên roja duyem a kongirê de**

Di roja 01.07.2008'an de, (duyemîn roja kongirê) pirsa aştî di cîhanê de, çareserkirina aloziyan û xebat bona çareserkirina pirsên navneteweyî û aborî ên cîhanê, kete berbas.

Di vê beşê de hejmarek ji kesayetiyên beşdar di kongirê de yên weke **Mehmûd Ebas**, Serokê Hikûmeta Otonom a Felestînê, **Êhud Barok**, rêberê Partiya Karkerên Îsraîlê, **Yûsî Bilîn**, rêberê Partiya Yaşadî **a Îsraîlê** û **Celal Talebanî**, axivîn.

**Tekezkirina "SI"yê derheq domandina xebat û çalakiyan bona çareserkirina pirsa Kurd**

Di pêşnivîsa roja duyem û destpêka roja sêyem a kongirê de, mijarên jêrîn ketine berbas û şirovekirinê:

- Hewldan bona guhartina aboriya cîhanê, ji rêyeke nû ve bi armanca xurtkirin û dabînkirina derfetên karî û wekhev ji bo gişt mirovan.
- Girtinepêşia rêçareyên hewce bona berbirûbûn tevî kirîza giranî û kêmbûna hewcehiyên xwerinê û çareserkirina kirîza han di pêşerojeke nêzîk de.
- Pirsa koçkirina mirovan ji bo welatên pêşkevtî.
- Pejirandina belge û biryarnameya "SI"yê derheq aştî û çareserkirina kirîzên navneteweyî di beşa têkildar bi Rojhilata Navîn. Hêjayî gotinê ye ku di vê biryarnameyê de, bendek ji bo pirsa gelê Kurd hatiye terxankirin. Di benda han de hatiye: "Enternasyonala Sosyalîst, li ser sozên xwe ên derheq çareserkirina aştîxwazane a kirîzên navneteweyî yên weke pirsa Kurd di Rojhilata Navîn de, tekezê dike".

Di heyama karê kongirê de, şanda PDK Îranê, belgenameyeke 27 rûpelî derheq cinayetên rejîma Komara Îslamî a Îranê li Kurdistanê di heyamê 6 mehên borî yên sala 2008'an de û her wiha nameya Mistefa Hicrî, li ser rewşa PDK Îranê û diyarîkirina rêçareya demokratîk ji bo çareserkirina pirsa Kurd li çarçoveya sîstemeke demokratîk û federal de, xiste ber destê beşdarên kongirê.

**Hevdîtinên şanda PDK Îranê di perawêza karê kongirê de:**

Şanda PDK Îranê li perawêza 23'hemîn kongireya "SI"ê de, hin hevdîtin tevî çendîn şandên beşdar di kongirê de pêk anî ku navê wan bi awayê jêrîn e:

- Partiya Karkerên Îsraîlê
- Partiya Sosyal Demokrat a Almaniyayê
- Serokê Partiya Sosyal Demokrat a Japonê ku yek ji cîgirên Serokê Saziya "SI"ê ye
- Berpirsê girûpa Kar a Kurdên "SI", birêz Konî Fîdrîkson
- Partiya Sosyal Demokrat a Swêdê
- Partiya Xelkê Pakistanê bi serokatiya Asêf Elî Serdarî, hevjînê Bînezîr Boto
- Serokê Partiya Demokrat a Nû ya Kanadayê
- Berpirsê Pêwendiyên Navneteweyî yên Partiya Sosyalîst ya Norwejê
- Berpirsê Pêwendiyên Navneteweyî yên Partiya Kar a Norwejê

Hêjayî gotinê ye ku di hevdîtinên han de, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê bal kişande ser binpêkirina sîstematîk a mafê mirovan li Îranê, daxwazên demokratîk ên gelê Kurd û hemû neteweyên Îranê, pirsa terorîzmê, pirsa bidestxistina çekên Etomî ji aliyê rejîma Komara Îslamî a Îranê û maytêkirin vê rejîmê li kar û barên welatên herêmê de.

23'hemîn kongireya Enternasyonala Sosyalîst, sibêdeya roja 30.06.2008'an, dest bi karê xwe kir û piştî sê rojan karê berdewam, roja 02.07.2008'an, dawî bi karên xwe anî.

www.arsivakurd.org

### Li bajarên Kurdistana Îranê, 19'hemîn salvegera Şehîdkirina Dr. Qasimlo û Ebdula Qadirî Azer

# Bİ GİREVEKE GİSTÎ HATE BİBÎRANÎN

Îsal 19'hemîn salvegera şehîdkirina Dr. Qasimloyê nemir, rêberê bilîmet û jêhatî yê PDK Îranê û kekê Ebdula Qadirî Azer ji salên borî mezintir û gireseyîtir hate bibîranîn. Îsal jî gelê Kurd li bajarên Kurdistana Îranê bi awayekî berfireh û girseyî tevger û çalakiyên curda cuda ên bibîranîna Şehîdên Viyenê û şermezarkirina wê kiryara cinayetkarane ji aliyê dîplomat terorîstên rejîma Komara Îslamî meşandin.

Xelkê welatparêz û azadîxwaz yê Kurd li bajarên Serdeşt, Bokan, Bane, Mehabad, Ciwanro, Seqiz, Urmiye, Pawe, Kirmaşan, Selmas û yên din, roja 22'ê Pûşpera 1387'an (12.07.2008)'an li ser bangewaza fermî a PDK Îranê, dikan û bazar daxistin û bi vî awayî nerazîbûna xwe a aştiyane û bê hebûna tu tund û tûjiyekê li hember kiryara hovane a terorkirina Şehîd Dr. Qasimlo û hevalên wî ji aliyê dîplomat terorîstên rejîma Komara Îslamî nîşan dan. Di çend salên borî de jî xelkê li bajarên Kurdistanê di wê rojê de dikan û bazar daxistibûn, lê îsal gireva han a nerazîbûnê gellek berfirehtir û qirseyîtir hate meşandin. Ji ber vê yekê rewşa awarte li bajarên Kurdistanê hatibû ragihandin û hêzên ewlekarî û leşkerî ên Komara Îslamî di tev rê û şeqamên bajarên Kurdistanê de cihgir bûn. Bona pêşîgirtin ji birêveçûna girevgirtina han ji aliyê xelkê Rojhilatê Kurdistanê ve, hêzên rejîmê gaf ji xelkê xwarin û bi awayên cur bi cur zext û givaş ji xelkê û nemaze dikandaran re anîn, lê xelkê dikan û bazar daxistin û gireveke berfireh li bajarên Kurdistanê dihat xuyakirin.

Li piraniya bajar û herêmên derdorê ji aliyê endamên xebatkar û netirs yên nepenî ên PDK Îranê çalakiyên teblîxî hatin pêkanîn û bi belavkirina wêne, CD, pirtûk, daxuyanî û nivîsandian dirûşman, Dr. Qasimlo hate bibîranîn.







**3 dîmen ji daxistina dukan û bazaran li bajarên Kurdistana Îranê bi boneya 19'hemîn salvegera terorkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî**

Ji bo tirsandina xelkê welatparêz yê Seqizê ku sibêdeya îro 22'ê Pûşperê (12'ê Tîrmeha 2008), 3 helîkopterên Kubra li esmanê bajarê Seqizê digeriyan. Di şeqaman, cihên giştî û heta kûçeyên bajarên Kurdistanê de, hêzên bi tevahî çekdar û garda taybet hatibû cihgirkirin. Hêzên rejîma Xomeynî li bajarên Kurdistanê li hêcet û mihaneyekê digeriyan ku wê gireva nerzîbûn û şermezarkirinê serkut bikin û weke salên berê xwînê birêjin, xelkê Şehîd, birîndar û binçav bikin.

**Şeva 22'ê Pûşperê, Kurdan Çiyayên**

**Malên Xwe Temirandin**

Xelkê Kurdistanê, piştî daxistina dukan û bazaran û birêvebirina girevgirtina seranserî bi hinceta 19'hemîn salvegera terorkirina Dr. Ebdulrehman Qasimlo û Ebdula Qadirîazer, di şeva 22'ê Pûşperê(12.07.2008)'an de, bo heyamê sê deqîqeyan çirayên malên xwe temirandin.

Her wiha êvariya roja 22'ê Pûşperê xelkê bi berkirina kincên Kurdî daketin ser şeqam û kûçeyan.

Ji ber vê çalakiya şermezarkirinê û gireva nerazîbûnê, gundî li herêmên cur bi cur ên Kurdistanê, wê rojê neçûn bajaran û di gundên xwe de Şehîdên bûyera terorîstî a Viyenê bibîr anîn.

Ji bo rêzgirtin ji 19'hemîn salvegera şehîdkirina Dr. Qasmilo û hevalên wî, li welatên cur bi cur ên Ewropayê weke Danîmark, Swêd, Norwej, Fînland, Birîtanya, Fransa, Otrîş û herwiha Kanada û Amerîkayê jî endam û alîgirên PDK Îranê û Kurdistaniyan, semînar, panel, meş û rê û resmên mezin û qirseyî pêk anîn û li hin welatan meşnên nerazîbûnê ji bo şermezarkirina cinayeta hovane a Viyenê di sala 1989'an de hatin lidarxistin.

Li binke û baregehên PDK Îranê de, çalakiyên cuda cuda û rê û resm û semînar bona rêzgirtin ji bîranîna Şehîdkirina Dr. Qasimlo û Kekê Ebdula Qadirî Azer birêve

## Bi Hinceta 22'ê Pûşperê, Rê Û Resmek Hêja Û Berfireh Di Navenda 3'ê A Kurdistanê De Hate Lidarxistin

Roja 22'ê Pûşpera îsal(12.07.2008)'an, bi hinceta terorkirina Dr. Ebdulrehman Qasimlo û Ebdula Qadirîazer, rê û resmek hêja û berfireh li Navenda 3'ê a Kurdistanê, bi beşdariya sedan kes ji Kadro û Pêşmerge û endam û malbatên wan û her wiha komîteyên Hewlêr, Kampa Kawe û Kampa Soran ser bi rêxistina navenda 3'ê a Kurdistanê hate lidarxistin.

Rê û resm bi xwendina sirûda neteweyî a "Ey Reqîb" û deqîqeyek bêdengî ji bo canê paqij yê şehîdên



Kurdistanê dest pê kir. Piştre peyama Navenda 3'ê a Kurdistanê bi vê hincetê ji aliyê Mihemedsalih Qadirî, endamê Komîteya Navendî û berpirsê Navenda 3'ê a Kurdistanê ve hate pêşkêşkirin.

Mihemedsalih Qadirî di peyama xwe de serbarê bibîranîna bûyera terorkirina Dr. Qasimlo û Ebdula Qadirîazer, bal kişande ser rola berçav a Dr. Qasimlo di bizava neteweyî a Kurdistanê de.

Piştre peyama Komîteyên Soran, Hewlêr, Kampa Kawe û Yekîtiya Xwendekar, Jinan û Ciwanên Demokratê ên Kurdistana Îranê hate xwendin.

Her wiha di doma rê û resmê de, çendîn helbest û pexşan û sirûdên şoreşvanî hatin pêşkêşkirin.

www.arsivakurd.org

# Bizava Neteweyî A Kurd Ji Nêrîna Dîroka Siyasî Ve

Beşa 3

**Bêhzad Xoşhalî ***
**Wergeran ji Farsî/ Omîd Esxeran**

Simayîl Axayê Simko, sala 1825'an a Zayînî hate dinê û piştî mirina babê wî, rêberiya êla Şikak kete stûyê Simayîl Axayê Simko. Navhatî piştî şerê cîhanê ê yekem hate nav biyava berxwedana siyasî ji bo bidestveanîna mafê Kurdan. Berî wê demê, Simko li tu çalakiyeke siyasî beşdar nebûye. Her çend ku ji ber pêgeha bihêz ya eşîretî di heyamê şer de, ji aliyê hêzên Rûs ve hate binçavkirin û ji bo Tiflîsê hate dûrxistin, lê piştî heyamekê bi merca rûniştina bi neçarî li bajarê Xweyê, serbest hate berdan.

Di destpêkê de hewce ye em qala 5 sedemên: Kiryar, Sebeb, Biyav, Alav û Armancê di bizava Simko de bikin.

Kiryar: Bizava Simko

Sebeb: Siyamîl Axayê Simko

Biyav:

A): Dem 1919 – 1930(bo heyamê 11 salan)

B): Cih: Herêma Bakûrê Rojhilat û Başûrê Rojhilat yê Kurdistanê

Alav: Bizava çekdarî li rex dîplomasiya navneteweyî di çarçoveya pêwendiyan tevî nûnerê Rûs, Birîtaniya û Îranê

Armanc: Azadiya Kurdistanê û avakirina dewleta Kurdî

Simko piştî bidawî hatina şerê yekem ê cîhanî, weke rêberek siyasî hate nasîn û bi armanca avakirina dewletek Kurdî di herêmê de, di sala 1919'an de, tevgera xwe dest pê kir û beşek berçav ji herêmên Rojhilatê Kurdistanê(Bakûrê Rojavayê Îranê) azad kir, lê di sala 1921'an neçar bi paşdekişiyanê bû û ber bi welatê Turkiyê reviya.

Di sala 1924'an de, bi ragihandina efûya giştî vegeriya Îranê, lê di sala 1926'an de dîsan dest avête bizavek din û vê carê jî piştî têkçûna hêzên wî, hate binçavkirin û bo welatê Turkiyê hate dûrxistin û di wî welatê de hate zîndanîkirin. Simko piştî azadbûnê vegeriya Îranê û di encam de di sala 1930'an de bi darêtina pîlanekê ji aliyê Riza Xan ve hate şehîdkirin. Bizava Şikakan bi şehîdbûna Simko, piştî 11 salan çalakiyên lekşerî û siyasî, bidawî hat.



**Taybetmendiyên serhildana Simko**

1- Bizava Simko bizavek herêmî bû û eşîra Şikak xwediyê rolek berçav di vê bizavê de bû

2- Eşîra Şikak ji du êlên Evdûyî û Memdûyî pêk hatiye ku li bakûrê gola Urmiyê akincî ne

3- Sedema bingehîn di pêkhatina hizra tevgera Simko de, kompoloya kuştina Ceweraxa ji aliyê Fermandarê Mehabadê ve bû

4- Simko di gişt axavtinên xwe de, qala azadiya Kurdistanê û avakirina dewleta Kurdî dike

5- Navhatî jî weke Şêx Ubeydula Neherî, di pêwendiyên xwe de, ji bo Kurdan ji peyva netewe mifahê distîne û serbarê pêşkêşkirina mînakan, bi aweyekî berdewam ji hin peyvan mifahê distîne ku "bindestbûna neteweya Kurd" û "Mafê diyarîkirina çarenivîsê" bi wateya îroyî dixe ber bîr û hizra meriv.

Di nameya Simko ji bo Zeferuldolê, fermanderê hêzên Azerbaycanê de, hatiye: "Hûn binêrin gellek neteweyên biçûk û kêm yên cîhanê ku di warê berfirehiya coxrafî şêniyan ve ji neteweya Kurd kêmtir in, çawa karîne azadiya xwe li hember dewleta Almanyayê bidestve bînin û bigihîjin serxwebûnê. Heke neteweya Kurd jî nekare mafê xwe ji dagirkeran bistîne, mirin ji bo gelê Kurd baştir e ji êxsîrî û bindestiyê".

Her wiha Simko di bersiva pirsên General Şerîf Paşa, nûnerê herêmên Kurdakincî li Stanbolê, dibêje: "Di zirûfa niha de, ez rêberiya tevgera Kurd dikim û hêj ez ne xwediyê rêxistinek îdarî û siyasî me. Giringtirîn armanca me, azadiya Kurdistanê ye û dema ku em gihîştin azadiyê, wê demê ne girîng e ku çi kesek rêberê Kurdistanê ye. Ez bixwe tu car ji rêberiya gişt Kurdan û desthilatdariyê re ne hizirîm. Derheq alayê jî ku we pirs ji min kirbû, bi baweriya min roja ku Kurdistan rizgar be, em dikarin ji alayê re jî bifikirin ku dê wê bikin sembola neteweyî a xwe".

6- Pêwendiyê dîplomatîk:

- Li Nîsana sala 1919'an, Simko Seyîd Taha weke nûnerê xwe dişîne Bexdayê hetanî ku tevî Wîlson, nûnerê Birîtaniyayê li Mezopatamiyayê gotûbêjan bike. Mijara sereke di gotûbêjên han de, hewl ji bo bi qîm gihandina Birîtaniyan ji bo pejirandina serxwebûna Kurdistanê û avakirina dewletek serbixwe a Kurdî ye.

- Îlona sala 1921'an, Simko li bajarê Şinoyê tevî Kaks, nûnerê Birîtaniyayê, hevdîtinekê pêk tîne. Hevdîtinên han bi awayekî qonax bi qonax hetanî sê salan dom dikin.

- Di sala 1924'an de, di nameyekê de ji bo nûnerê Birîtaniyayê li Mezopotamiyayê, dinivîse: " Ez û Seyîd Teha sozê didin we herdem ku dewleta Birîtaniyayê amade be ku bona avakirina dewleteka serbixwe a Kurdî, piştevaniyê ji me bike, em dê Turkên nejadperest ji bajarên Kurdakincî bavêjin derê. Em dikarin heya Enqerê jî tevî dujminan şer bikin, heta em dikarin li başûr jî, heya Sine biçin û herêmên Kurdakincî ji destê rejîma Îranê bînin der".



* lêkolînvan û nivîskarekî Rojhilatê Kurdistanê ye

- Simko di sala 1922'an nûnerek xwe şande cem Rûsan, lê Yekîtiya Soviyet a berê ji ber peymannameya 26'ê Şibata 1922'an û normalbûna pêwedniyên Soviyet û Îranê, daxwaza Simko napejirîne.

- Hevdîtin tevî Heyder Beg Kurk li Şemzînan û daxwaza hevkariyê ji wî

7- Hevdembûna bizava Simko tevî serhildana Şêx Mehmûd li başûrê Kurdistanê û Serdar Reşîdxan li herêma Kirmaşanê ku ji aliyê Birîtaniyayê ve piştevanî jê dihate kirin û weke kesek bona serokatiya Kurdistanê hatibû diyarîkirin

8- Pêşwazîkirin ji Şêx Mehmûd weke Lehengek Neteweyî û bi fermî nasîna navhatî, weke rêberê gişt Kurdan

9- Renge çi di biyava Kiryar û çi jî di dîroknivîsandinê de, em tu rêberek Kurd weke Simko mêze nekin ku bi vî awayî neketibe ber xezeba dagirkeran

Simko di yek ji daxwazên xwe ji bo "Wezareta Derve a Soviyetê" de, dibêje: " Ez girîngî û pûteyek zaf didim Soviyetê ku piştevaniyê ji azadiya gelên bindest ên cîhanê dike. Heke di cîhanê de, neteweyek bi şeref û xwediyê pirensîp û pîvanan hebe ku heya niha negihîştibe azadî û serxwebûnê, ew netewe, neteweya Kurd e ku ji aliyê cîranê xwe yê bakûr ve jî piştevanî jê nahê kirin ku ez jî endamek biçûk ji wî gelî me. Ez ji bo azadiya gelê Kurd, amadeyî her cure hevkariyekê me(rapora Çîçrîn bo Wezareta Karê Derve ya Rûsiyê 1922).

Belgeya Wezareta Karê Derve ya Birîtaniyayê

Simko û helwesta Birîtaniyayê li hember bizava wî

Belgeya hejmar(371)(2262) bervara 20'ê Tîrmeha 1921'an, nameya nihênî a leşkereke siyasî yê Birîtaniyayê li bajarê Raniyê ye:

Îşare bi nameya Simko ji bo Babekr

Pişder, nêrîna min derheq vê nameyê bi awayê jêrîn e:

Simko ku di heyama temenê xwe de, jinavçûna çend dewletan bi çavên xwe dîtiye, bi sehkirina vê çendê ku hikûmeta niha, xwediyê rûçikek cuda ye, hêj cihê xwe yê rastîn ne nasiye. Ew bi tu awayekê neamadeyî ji dest dana desthilata niha ye, di encama vê çendê de, ew lişûn peydakirina alîgirek biyanî ye. Derheq herêmên bakur jî berfirehbûn û bihêzbûna pêwendiyên me tevî Simko dê baştirîn bandorên xwe yên erênî hebin. Rast û nerast Simko niha gihîştiye nav û dengek zaf ku bi hurmet ve qala wî tê kirin. Bi nêrîna min, em dikarin bi hevkarî û piştevanîkirin ji Simko, gellek asteng û girêpêçkên hemberî xwe ji holê rakin.

Fo371/6347/2262, 20 July 1921

Her di heman belgenameyê de(S.63 bervara 20.07.1921), nameya Simko ji bo Babekr Axayê Silêmaniyê hatiye tomarkirin ku Mela Silêman ew name gihandiye destê Babek Axa. Naveroka namê bi vî awayî ye: “ Tu hikûmetek din ji bilî Birîtaniyayê karîna birêvebirina kar û barên herêmê nîn e. Belşvîk piştî pêşveçûnên qonax bi qonax, di encam de neçar man ku bisekinin û ber bi welatê xwe vegerin. Em dikarin Îranê jî weke dewletek bihêz bihesibînin. Mistefa Kemal û hêzên wî jî ji bîst hezar kesan derbaz nabe û piropagendeyên wî ji bo êrîşa bo ser herêmê bi du armancan tê meşandin: A yekem Bandora nerênî li ser yekîtiya eşîran û a duyem jî komkirina pere û wergirtina bacan e. Hêzên çekdar ên Turk jî ku hatine Kanî Reşê, tu armnacek ji bilî tirsandina eşîrên herêmê nîn in. Ez vê çendê baş dizanim ku ez bi buxtana dek û fêlbaziyê hatime tawanbarkirin, lê tu kes amadeyî bihîstina axavtinên min derheq berevanîkirin ji xwe nebûye. Ne kiryarên min ên niha û ne jî yên berê, tu yek ji wan ji bo dujminatî tevî Birîtaniyayê nebûne, berevajî vê çendê, min herdem hewl daye ku pêweniyên baş tevî Birîtaniyayê de lidar bixim. Di encam de ez daxwazê ji we dikim ku di pêwendiyên xwe tevî Birîtaniyayê, derheq min hêwirandinên hewce werin kirin. Ez amade me ku ji bo gotûbêjkirina tevî nûnerê hikûmetê herim bajarê Şinoyê, ez erxayîn im ku em xwediyê gellek xalên hevbeş in.

Di tomareke din hejmara(C/61 bervara 29.07.1921) ku ji aliyê leşkerê Birîtaniyayê ji bo nûnerê Samî hatiye şandin, hatiye: “Ez tevî nirxandinên cîgirê leşkerê siyasî li Raniyê Kapîtan Kuk, hevdeng im, serbarê vê çendê ku ez bala we bo xalên jêrîn jî dikişînim:

1- Çarçoveya herêmên bin desthilatdariya Simko li herêmên Kurdakincî ên navbera Îran û Turkiyê bi awayê jîrîn e:

1- Hêlek dirêj ji Bîrekepere bi dirêjahiya Zêya mezin û ji wir jî ber bi sînorê Dîlman(Selmas) hetanî Xweyê. Ji Xweyê ber bi başûr hetanî qiraxên gola Urmiyê û ji wir jî hetanî Sildoz û Bane ji bilî Sine û Mehabadê. Bêguman, alîgiriya menewî a Birîtaniyayê dibe sebeb ku navhatî çarçoveya desthilata xwe hetanî bajarê Diza(Rojavayê Îranê) berfireh bike


2- Renge Seyîd Taha li bersiva daxwazên Simko ji bo gotûbêj tevî Birîtaniyayê, were nava gotûbêjan

3- Lidarxistina pêwendiyan tevî Simkoyê bihêz, gefa li ser sînorên me ji nav dibe

4- Derheq Îranê jî divêt ez bibêjim ku ew welate ji ber jidestdana erdên xwe nigeran nabe

5- Derheq Simko jî, divêt em bibêjin ku navhatî kesayetiyek bihêz e, di encam de nabe bi tevahî bawer pê were kirin. Eger çi wî bi rûyekî hêzên Îranê têk şikandine, lê ew bi başî haydarê vê çendê ye ku piştgirêdan bi eşîrên xwecih, weke take alîgir, karekî baş nîn e, di encam de hewlê dide ku tevî hikûmetek weke Birîtaniyayê bikeve nav gotûbêjan

Bi nêrîna min, bihêzkirina piştevaniya menewî ji navhatî di dirêjheyam de, dê me neçar bike ku li hember hemû şert û mercên wî teslîm bin.



## Şiroveya Peyvên Siyasî

Berhevkar: Omîd Esxeran
omid_anbi@yahoo.com

# Kolektîvîzm

Kolektîvîzm ji peyva “Collecte” ku bingeha wê vedigere bo peyvika latînî a “Collecta” ku tê wateya sîstema aborî a hevbeş, hatiye wergirtin. Têgiha han li hember takekesxwaziyê(îndîvîodalîzm) tê bikaranîn û pêkhatî ye ji hemû teoriyên aborî û civakî ku rastî û berjewendiya girûp yan civakê li serweyî hemû berjewendiyeke takeksan dihesibîne. Li gir vê hizrê, alavên berhemanîn û dabeşkirinê divêt di bin çavdêriya girûp yan civakê de bin ne a tekakesan ku lişûn berjewendiyên xwe yên taybetî ne. Her wiha navê sîstemekê ye ku li ser bingeha çavdêriya han a girûpî hatiye avakirin.

Sosyalîzm û komonîzm ji rêya milkdariya giştî ve, daxwaza çavdêriyek bi vî awayî ji bo dabînkirina berjewendiya tim endamên civakê ne. Milkdariya giştî, milkdariya hikûmî û saziyên herwezî bixwe ve digire. Hêjayî gotinê ye ku asta beşdarîkirina endamên civakê di wan biryaran de ku li ser jiyana wan bibandor in, xwediyê şêwazek taybet bixwe ne. Bo mînak wateya jiyana girûpê li Kîbotsêkiya Îsraîlê tevî Kolxozek Soviyet û Komoneka Çînê ferq û cudahî heye. Milkdariya hikûmî ne tê wateya çavdêriya giştî, belkî girêdayiyê vê çendê ye ku desthilata dewletî di destê kî/ê de be. Lewra hin kolektîvîst daxwaza beşdariya resterast a kedkaran di derkirin û dana biryaran de ne. Her weke çawa alîgirên sosyalîzma pîşeyî daxwazeke wiha dikin.

Têgiha han li serdemê lidarxistina yekemîn kongireya navdewletî a sosyalîstan ku di sala 1869’an li bajarê Bazel li welatê Swîsê hate lidarxistin, geşe stand û pêwendiyeke nêzîk tevî soyalîstan ava kir. Wiha tê texmînkirin ku di vê kongireyê de peyva han ji bo nasandina xwendingeha sêyem a sosyalîzmê li hember xwendingeha Marks û Pirodon hatibe bikaranîn û merema wan eva bibe ku ev komonîzma ku ew dixin holê, li ser bingeha hevkariyê be, ne desthilatê.

Hewcehî gotinê ye ku Kiropaktîn cudahî di navbera du qonaxên civaka şoreşger a pêşerojê û wan du qonaxên ku bi Kolektîvîzm û Komonîzm dihatin navbirin, didanîn. Li gor hizra wî, Kolektîvîzm qonaxeke vegihuzer(Ragiwêzer) e ku milkdarî tê de heye, lê bi şêwaza milkdariya civakî. Piştre peyva han bi awayekî berfirehtir hate bikaranîn û çend peyvên nû ên weke: A) teoriyên sosyalîstî ên cur bi cur û daxwazkerên çavdêriya civakî bi taybet şêwaza desthilatxwazane a wê, B) Pitir bi wateya wê a nebaş ji aliyê teoriyên sosyalîst û ne sosyalîstan ku daxwaza maytêkirina herçiqas zêdetir a dewletê bi taybetî di kar û barên aborî de, bûn. Bi wateyeke din, wan daxwaza aboriyek hikûmetî dikirin. Hin caran du wateyên han ji bo aboriyeke Nazîst û Faşîstî jî tê bikaranîn.

**Çavkanî:**
**(Ferhengî Ramiyarî Nîga) Azad Weledbegî**
**(Danêşnamêyê Siyasî) “Politicial Dictionary” Daryûş Aşorî**

www.arsivakurdi.org

## Ramanên Dr. Qasimloyê Rêber, Çirayê Rêya Xebata Me Ye

19 sal bi ser cinayeta hov û ne mirovane a terorkirina Dr. Qasimlo, rêberê navdar û bilîmet yê gelê Kurd û Sekreterê Giştî yê PDK Îranê û Ebdula Qadirî Azer bi destê terorîstên rejîma Komara Îslamî a Îranê borî.

**Desteya Weshana Agirî** tevî mehkûm û şermezarkirina ew kiryara terora dewletê a hikûmeta Îranê, rexneyên tund ên xwe raberî hikûmeta Otrîşê dike ku heta niha dosya vê terorê daxistî hiştiye. Em daxwazê ji rêxistin û komeleyên mirovhez û parêzerên mafên mirovan û partiyên siyasî dikin ku bona vê yekê bixebitin da ku dosya terorkirina Dr. Qasimlo û hevalên bihê holê.

agirî

# Peyama Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Derheq 19'hemîn Salvegera Şehîdkirina Dr. Qasimlo Û Hevalên Wî

**Hevwelatiyên xweştevî!**
**Xwîşk û birayên hêja!**
**Mêvanên delal!**

Îcazê dixwazim, ji aliyê Polîtbîroya PDK Îranê ve bi can û dil xêrhatina we bikim ji bo beşdarîkirin di rê û resma teror û şehîdkirina Dr. Ebdulrehman Qasimlo û rêzgirtin ji bîranîna wî rêberê zana û navdar yê gelê me û hevalên wî ên şehîd.

Îro 19 sal bi ser terorkirina rêberê zana û bilîmet yê PDK Îranê û kesayetiyê navdar ê tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd dibore. 19 salan berî niha, di roja 13'ê Tîrmeha 1989'an de, xebatkarê leheng yê gelê me, Dr. Ebdulrehman Qasimlo, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê û hevalê egîd Ebdula Qadirî Azer, endamê Komîteya Navendî û nûnerê partiyê li derveyî welat û Dr. Fazil Resûl, dostê partiyê, ketin nav pîlan û komployeke li pêşde darêtî a rêberên rejîma Komara Îslamî a Îranê, di civîneke gotûbêjan ji bo çareserkirina aştiyane a pirsa Kurd bi destê dîplomat terorîstên rejîma han berevajî hemû rê û cihên mirovî, siyasî û dîplomatîk li bajarê Viyen, paytexta Otrîşê hatin şehîdkirin. Rêberên rejîma Komara Îslamî a Îranê bi encamdana vê kiryara terorîstî tawaneke mezin derheq civata navneteweyî û nemaze gelê Kurd û PDK Îranê afirandin û rûreşiyeke din jî di karnameya reş û tejî şermezarî a xwe de tomar kir.

Ev sûça rêberên rejîma Komara Îslamî a Îranê bi qasekê giran û dilêş bû ku pirr zû di asta navneteweyî de deng veda û dilê hemû mirovek azadîxwaz hejand. Her eva jî bû sedem ku kom û komeleyên mirovhez ev kiryara terorîstî şermezar kirin û hevderdî û hevxemî bi Partiya Demokrat re dan xuyakirin û daxwaz ji dewleta Awusturyayê kirin, sûçbarên vê cinayeta hovane bi civata navdewletî re binasîne.

Mixabin serbarê vê çendê ku nasnameya gunehkaran bi tevahî xuya û eşkere bû û tu kesî guman ji encamdana kiryara wan a terorîstî tune bû, dewleta Otrîşê bi dezgeha dad û ewlekariya xwe ve, kêmtirîn helwest li hember vê tawana mezin negirt û bê baldan bi nirx û bihayên mirovî, terorîstên han bi awayekî fermî ji Îranê re şandin û xwîna rêberên Kurd kire goriyê qazanc û berjewendiyên aborî tevî rejîma Tehranê.

**Gelî xwîşk û birayên hêja!**



Dr. Qasimlo li ser vê baweriyê bû ku Kurd neteweyek e û Kurdistan yek nîştiman e, heke di bin siya xebat û berxwedana rewa û berheq Kurd bigihîjin serweriya xwe ya siyasî, ew ne tenê tawan û sûç e, belku ew hevgirtina netewe û nîştimaneke parvekirî ye

Rêberên rejîma Komara Îslamî a Îranê piştî ji rê derxistina rêbaza şoreşa gelên Îranê û astengxistin li ser rêya xebat û tekoşîna hêzên demokrat û pêşverûxwaz ên welat û pêşgirtina siyaseta zext û givaşxistin bi ser xebata hêzên siyasî û neçarkirina kesayetiyên azadîxwaz bona ku ji welat birevin, siyaseteke bêrehmane û dijî gelî derheq gelên Îranê û nemaze gelê Kurd û PDK Îranê girtiye pêşberî xwe. Bi taybet li dor kesayetiyekî navdar û demokrat weke Dr. Qasimlo ku bi kiryar siyasetên rêberên rejîmê dida kifşê û şermezar dikir û li hember wan helwest digirt, bêzar bibûn û Dr. Qasimlo û Partiya Demokrat bi xetereke mezin bona pêşdebirina siyasetên xwe dizanî.

Her eva jî bû ku rêberên vê rejîmê di Kurdistanê de çendîn şer û fitne afirandin, bona vê yekê ku rûçikê geş û ronak yê Partiya Demokrat û kesayetiya Dr. Qasimlo xirab nîşan bidin û bi xeyala xwe derfetê bona şer û fitneyên xwe di Kurdistanê de pêk bînin. Li ser bingeha vê polîtîkê bû ku Xomeynî Fetwaya Cîhadê li dijî xelkê Kurdistanê da û ji vê çendê jî kîndar bû ku Dr. Qasimlo piştî hilbijartina wî ji bo nûnerê xelkê Kurdistanê ji bo Meclîsa Xibregan neçû Tehranê û nekete destê wan heta ku her wê demê Şehîd bikin.

Lê mixabin heke di çepera xebatê de nekarîn bi wê hêviya xwe bigihîjin, ji wê rêyê ve di welateke demokratîk ê Ewropayê de zefera xwe ji bo terorkirina wî kesayetiyê aştîxwaz birin û li pişt ve xencera xwe li wî xistin û gihîştin ew merema xwe ku demek dirêj bû jê re hewl didan.

**Hevalên hêja!**

Jiyan û xebata siyasî û geş a Dr. Qasimlo ji hemûyan re eşkere ye, Dr. Qasimlo ji wê demê ve ku xwe nas kiriye, rêya fêrbûna zanist û siyasetê girtiye pêşberî xwe û çepera xebat ji bo serbestiya netewe û nîştimana xwe, xebat ji bo azadî, demokrasî û dadperweriyê hilbijart. Dr. Qasimloyê nemir heta dawiya jiyana xwe li hember zilm, zordarî, dîktatorî û ne wekheviyê xebat kir.

Dr. Qasimlo di serdemê zêrîn ê Komara Kurdistanê de, di refa Yekîtiya Ciwanên Demokra ên Kurdistanê de xebata siyasî

www.arsivakurdi.org

dest pê kir, piştre di rêxistinên Partiya Demokrat de wekî yek ji xebatkarên partiyê hate ort û çepera xebata siyasî û wekî Kadroyekî leheng û bilîmet yê partiyê di qonaxên cuda cuda ên tevgera azadîxwaziya Kurd de, rola bi bandor a xwe lîst û bû yek ji rêberên tekoşer yên PDK Îranê. Dr. Qasimloyê nemir piştî hilweşandina Komara Kurdistanê, analîz û şîrovekirineke hûr û karnasane li ser sedemên hiloşandina Komarê kir û gihîşte wê encamê ku tevgera Kurd û PDK Îranê hewcehî bi xwe organîzekirina nû û serbixwe heye. Her eva jî bû ku piştî çend salan xebata bêrawestiyan tevî komek xebatkarên partiyê di sala 1334'an a Rojî (1955), bi awayekî fermî pêwendiyên rêxistinî yên PDK bi Partiya Tûde a Îranê re birrî û fesleke nû di xebata siyasî a partiyê de dest pê bû. Ew helwesta Dr. Qasimlo û hevbîrên wî di dîroka partiya me de weke rûpeleke zêrîn û helwesteke rêzanî (siyasî) û neteweyî hate tomarkirin. Helwestek ku bû xîm û bingeha serxwebûna siyasî a partiya me û serhildana tevgera rizgarîxwaz a gelê me.

Dr. Qasimlo piştî derbazkirina wê qonaxê û domandina xebata siyasî, carek din bi sedema guhertinên siyasî ên Îranê û Kurdistanê ku berevajî hêvî û xweziyên Dr. Qasimlo bûye, tevî komek astengên siyasî berbirû dibe, bi sedema wan guherînên siyasî ve, rêberiya PDK car din rastî cudabûn û curek ji hev belavbûnê hat ku bo demekê partî ji siyaseta usûlî ya xwe dûr ket.

Dr. Qasimlo û hevalên xwe ku ji wê rewşê bi tevahî bêzar û nerehet bûn, bi awayekî karnasane di hewl û cehda wê yekê de bûn ku partiyê rizgar bikin. Carek din ji wê derfeta ku piştî derkirina daxuyaniya dîrokî a 11'ê Adara 1970'an ku di navbera serkirdayetiya siyasî a Kurd li Başûrê Kurdistanê û dewleta wê demê a Îraqê pêk hat, bi zanebûn ji rewşa han mifah stand û vegeriya Başûrê Kurdistanê û bi endamên partiyê ku ji rewşa han bêzar bibûn, têkilî çê kir û li pey nirxandineke kûr, konferansa sêyem a partiyê girt û ser li nû cehd û hewla vejandina rêxistinên partiyê û vegerandina partiyê bo ser rêbaza eslî ya xwe da û dû re jî kongreya sêyem jî lidar xist û fesleke nû di xebata partiya me dest pê kireve û rê û rêbazeke siyasî û rêxistinî a pêşverû jê re hate diyarîkirin.

Ji wê demê heta niha, serbarê vê çendê ku PDK Îranê di xebat û tekoşînê de gellek evraz û nişîv jê re pêk hatine û bûye xwediyê ceribînên zaf, bi keyfxweşî ve ew rûmet û şanazî vedigere bo rola bi bandor a Dr. Qasimlo û ew xebata mikum û bêwestiyan ku wî ji bo saxkirin, nûkirin û geşandina PDK Îranê meşand.

**Hevalên qedirgiran!**

Baskirin li ser rola xuya û berbiçav a Dr. Qasimlo û kesayetiya bilind a wî, dem û derfeteke zaf dixwaze, li vir em dê tenê qala kurtiyek ji wê xebata berçav a wî rêberê navdar yê gelê Kurd bikin:

Dr. Qasimloyê zana di asta hundirî û navneteweyî de jî analîz û şîrovekirineke pisporane hebû, wî serbarê vê yekê ku rêberiya tevgera neteweyî – demokratîk a Kurdistana Rojhilat dikir û ji bo dabînkirina azadî û demokrasiyê di Îranê de dixebitî, berevanî ji mafê gelên Îranê dikir, her di wê demê de jî, ew ramane jî hebû ku Kurd neteweyek e û Kurdistan yek nîştiman e û heke di bin siya xebat û berxwedana rewa û berheq a keç û xortên xwe bigihîje serweriya xwe ya siyasî, ew ne tenê tawan û sûç e, belku ew hevgirtina netewe û nîştimaneke parvekirî ye. Di vê derbarê de jî, Dr. Qasimloyê zana ji bo parastina vêc û berjewendiyên neteweyî ên Kurd gavên pirr mezin avêt û

- li ser vê baweriyê bû, partî û rêxistinên siyasî ên Kurd bi hev re hevkariyê bikin û ruha neteweyî bikin rêbaza wê hevxebatiyê.

- Nêrîna wî ewa bû ku divêt pêwendiyên partiyên Kurdî bi welatên têkildar bi pirsa Kurd re, li ser bingehekê be ku zirar û ziyan negihijîne tevgera Kurd di wî parçeyê Kurdistanê de.

- Her wiha siyaseta maytêkirina partiyan di nav kar û barên hevdu de berevajî berjewendiyên Kurd dizane û weke siyasetek ne rewa dihesibîne.

- Her wiha Dr. Qasimlo li ser vê baweriyê bû, di asta navneteweyî de jî, ji bo parastina vêc û berjewendiyên siyasî û neteweyî ên Kurdan bi giştî, ziman û helwesteke hevbeş bi hewcedariyeke siyasî dizanî. Di kom û komeleyên navneteweyî de, wî herdem pirsa Kurd bi giştî bas dikir û ji raya giştî a navneteweyî re dinasand, di wê rêyê de serkevtin û şanaziyên berçav ji bo tevgera Kurd tomar kir.

Qasimloyê nemir ji ber pisporî û şarezabûna tewaw tevî çanda Rojava û zimanzanîn û vekolîna zanistî û tev alî li ser Sosyalîzm û demokrasiyê, jêhatîbûna xwe di asta navneteweyî de bêtir nîşan da û her ewa jî bû ku Dr. Qasimlo kire rêberekî navdar û siyasetvanekî mezin û dîplomatekî serkevtî û kesayetiyekî naskirî di warê siyaseta navneteweyî de. Lewra di dema şehîdbûna wî de, gellek

kesayetiyên siyasî, zanistî û parêzerên mafên mirovan, ji bo şehîdbûna wî xemgîn û nerehet bûn û hest û soz û helwesta xwe a dostane bi PDK Îranê re nîşan dan. Ew seha pîroz a siyasetvanekî navdar weke Dr. Bêrnard Koşner ku şanazî û rûmetê bi dostînî û zanabûna Dr. Qasimlo dike û dibêje: "Ew ji peyama aştiyê tirsiyan, lewra Pêxemberê aştiyê kuştin!". Yan dîrokzanek mezin wekî Dr. Kemal Mezher ku digot, Dr. Qasimlo rêberekî bê nimûne bû, an rojnamevan Kirîs Koçêra basa jêhatîbûn, bilîmetî û ji karîn û şiyana rêberîkirina wî û baweriya kûr a Dr. Qasimlo bi demokrasiyê û hesta mirovî a vî rêberê mezin dike.

Dr. Qasimlo girîngîdan bi demokrasiyê di nav partiyê û civakê de û xurt û berfirehkirina pirensîpên demokratîk, bi kakil û cewhera tevgera neteweyî – demokratîk a gelê Kurd dizanî. Her ew bîr û raman pêşverû jî bû ku bi piratîk PDK Îranê demokratîze kir û bi geşekirina wê pirensîpa hizrî û siyasî bû ku PDK di asta navneteweyî de gihîjande rêza partiyên demokrat û pêşketî û aqibet bû endamê malbata mezin a Enternasyonala Sosyalîst û gellek kom û komeleyên navneteweyî ên din û ji aliyê wan ve jî bi rêz û hurmet bi wî re tevdigeriyan.

Dr. Qasimlo yek ji wan rêberên bê nimûne bû ku li hember siyaseta rejîmên dîktator û xedar tevî gelên ku maf û azadiyên wan bin pê bibûn û zordariya li ser azadîxwazên welatên wan, sekinî û pirsa destwerdana mirovî a kom û komeleyên navneteweyî û cîhana pêşverû anî berbas û ew siyaset kire parek ji dîplomasiya tevgera rizgarîxwaz ya gelê Kurd.



Dîmenek ji beşdarên rê û resma bibîranîna şehîdên Viyenê di binkeya Defrtera Siyasî ya PDK Îranê de

**Hevalên birêz!**

Her wekî min berê bas kir, yek ji goriyên din ên tawana terorîstî a Viyenê, Kekê Ebdula Qadirî Azer endamê Komîteya Navendî û nûnerê partiyê li derveyî welat bû. Kekê Ebdula Qadirî yek ji wan xebatkarên partiyê bû ku di dema xebatê de, her erk û wezîfeyek jê re dihat diyarîkirin, bi can û dil dimeşand û encam dida û her ewa jî bû ku ji aliyê rêberiya partiyê ve, berpirsiyariya derveyî welat jê re hate sipartin û di wî erkê xwe de jî di hemû warekê de gellek serkevtin bidest xist û bû yek ji dîplomatên serkevtî yên partiyê li derveyî welêt û heval û hevrêyekî jêhatî yê rêberê navdar Dr. Qasimlo di hemû kom û komeleyan de û serencam di kêleka wî de canê paqij yê xwe pêşkêşî armancên gelê Kurd kir.

Kesayetiyekî din ku di vê bûyera terorîstî de jiyana xwe ji dest da, Dr. Fazil Resûl, dostê PDK û yek ji ronakbîrên kurd ên Başûrê Kurdistanê bû ku têkiliyek nêzîk bi Opozîsyona Îranê re hebû. Ew jî di wê bûyera cinayetkarane de bû goriyê siyaseta terorîstî a rejîma Komara Îslamî.

**Beşdarên hêja!**

Di meha Tîrmehê de bîranîneke din a tal ji me re heye, ew jî jidestdan û koça dawî a xebatkarê naskirî ê gelê me li Rojhilatê Kurdistanê, Kekê Seyîd Selam Ezîzî, endamê Deftera Siyasî û yek ji hevalên wefadar ê Dr. Qasimloyê rêber e ku di roja 15.07.1999'an, bi sedema nexweşiyeke bê wext çû ber dilovaniya Xwedê û bo yekcarî xatira xwe ji me xwast û erkê domandina xebatê siparte me.

Kekê Seyîd Selam Ezîzî li serdemê şoreşa gelên Îranê, têkilî bi PDK Îranê re çê kir û di refa xebatkarên partiyê de, gellek fidakarane û dilozane xizmet bi armancên partiyê kir û ji ber xebat û tekoşîna bêrawestiyan a wî, pileyên rêxistinî bi serkevtinê ve heta endamê Deftera Siyasî di nav partiyê de bazand û di nav partiyê de berpirsiyariyên cur bi cur ên girîng li stûyê wî bûn û bi rûmet û şanazî ve erk û wezîfeyên xwe dimeşand.

Kekê Selam Ezîzî xwediyê gellek taybetmendiyên bilind û helwestên siyasî bû, ew yek ji xebatkarên Partiya Demokrat bû ku li hember neyar û derfetperestên ku hewl û cehda ji rêderxistina partiyê ji rêbaza eslî a xwe didan, berxwedanî dikir. Wî ji bo parastina pirensîpên partiyê pirr hewil dida. Heta dema xatirxwastin ji hevçeperên xwe, bi dilsoziyeke zaf, wekî kesekî demokrat û şagirdekî sozdar ê rê û rêbaza Dr. Qasimlo xebat û tekoşîn didomand û bi rûmet û serbilindî ve Şehîd bû.





**Hevalên hêja!**

Em di demekê de cinayeta terorîstî a Viyenê bibîr tînin ku rejîma Komara Îslamî a Îranê di hemû warekê de tevî kirîzê rû bi rû ye, di astan navxwe bi sedema domandina binpêkirina mafê mirovan û serkut û çewisandina bêrehmane a tevgera azadîxwaziya gelên Îranê û tengezarî li hember dabînkirina daxwaziyên aborî ên civatên xelkê û di asta navneteweyî de jî, ji ber domkirina piştgirî ji terorîzma navdewletî, siyaseta maytêkirin di nav kar û barên welatan û kêmhesibandina vîn û îradeya navdewletî li pirsa gihîştin bi çek Etomî, di civata navneteweyî de bi tevahî terîk û munzewî bûye.

Li hember vê kirîzê de ku rejîma Komara Îslamî tûş bûye, tevgera gelên Îranê û xebata demokrasîxwazane ya azadîxwazên welatê me dom dike û roj bo rojê di halê xurtbûnê de ye û siyaseta tund û tûjî û serkutkirinê jî nekarî ye bi ser îradeya şoreşgerane a wan de zal be.

Ev xebata şoreşgerane di Kurdistanê de, germ û gurriyek taybet bi xwe ve girtiye û keç û xortên gelê Kurd bi wanewergirtin ji rêbaza Şehîdên xwe ên rêber bi hesetek pîroz ve xebata xwe ya tejî rûmet û şanazî dom dikin. Her ew seha pîroz û hêja ye ku hemû salekê bi awayekî bê mînak, 22'ê Pûşperê bibîr tînin û li sernaserê Kurdistanê û li derveyî welat jî rêz û humetê ji wî rêberê mezin digirin û şanazî û rûmetê bi xebata tejî serwerî a wî dikin.

Di salvegera Şehîdkirina rêberê me yê navdar, Dr. Qasimlo û hevalên wî de, carek din em tevî canê paqij ên wan şehîdan û rêbaza tejî rûmet a wan soz û peymanê nû dikin ku heta bidestveanîna armancên pîroz ên wan rêya xebatê dom bikin.

Her wiha di vê rê û resmê de, car din em daxwazê ji hikûmeta Otrîşê dikin ku li hember xwîna bi neheq rijandî a rêberên me, ji vê yekê zêdetir bêdeng nebe û tawanbarên vê bûyera dilêş ji kom û komeleyên mirovhez re binasîne û li hember binpêkirina serweriya qanûnê li welatê wan ji aliyê rejîma Komara Îslamî a Îranê ve ji vê çendê bêtir bê helwest nebin.

Di dawiyê de, carek din spas dikim ku hûn beşdarî vê rê û resmê bûn.

**Silav li canê paqij ê Dr. Qasimlo û hevalên wî**

**Bihiloşe rejîma terorîstperwer a Komara Îslamî ya Îranê**

**Serkeve xebata hevbeş a gelên Îranê ji bo anîne serkara rejîmeke demokratîk û federal**

Sosyologê Navdar, Dr. Îsmaîl Beşîkçî di 19'hemîn Salvegera Terorkirina Dr. Qasimlo Ji Bo Agirî Dipeyive:

# "DR. QASİMLO RONAKBÎR Û ABORÎNASEKE HÊJA BÛ"

**Hevpeyvîn: Azad Kurdî**

**Ez dixwazim, bi boneya salvegera şehîdkirina rêberê navdar yê gelê Kurd û Sekreterê Giştî yê PDKÎ, Dr. Qasimlo çend pirsan ji we bikim û dîtina we bigirim.**

**Weke ku hûn jî dizanin, di 13 Tîrmeha 1989'an de, Dr. Qasimlo li ser maseya gotûbêjê ji aliyê dîplomat-terorîstên Komara Îslamî a Îranê ve hate şehîdkirin.**


**Nêrîna we li ser pêkanîn û encama bûyerê çiye?**

**Dr. Beşîkçî:** Ez bi munasebeta 19 saliya şehîdkirina Dr. Qasimlo û alîkarên wî Dr. Ebdula Qadirî û Dr. Fazil Resul, wan bi hezkirinê bibîr dihênim.

Li Rojhilata Navîn polîtîka terora dewletê bi şêweyekî sîstematîk tê bikaranîn. Terora dewletê, bi giştî, li dijî xwestinên kurda yê mafê netewî tê bikaranîn. Dema dengê gelê kurd bilind dibe, mafên xwe yên netewî dixwazin, ew terorîst têne dîtin û nirxandin. Ji bo ku, qonaxa tekoşîna rizgariya mafê netewî yê kurdan bi derengî bikeve, serkevtinê bidest nexe, terora dewletê tê rojevê û wê li dijî kurdan piralî pêk dihênin.

Dewlet, ji bo ku terora xwe veşartî bihêle, terora wan eşkere nebe, dema eşkere bibe wê xwedî maf bide nîşandan, herdem qala "teror"ê dikin. Peyvên mîna *"em ê koka terorê ji holê rakin"* dikin.

## Hikûmeta Awusturyayê, Li Dijî Vê Terora Dewletê, Helwestek Ciddî Nîşan Nedaye Û Bûye Xwedî Helwêstek Li Gel Terora Dewletê Û Parêzvanê Terora Dewletê



## Li Rojhilata Navîn polîtîka terora dewletê bi şêweyekî sîstematîk tê bikaranîn

Di 13 Tîrmeha 1989Î'an de, li peytextê Awusturya li Vîyanayê, ji aliyê dîplomatên Îranê ve, ji bo hevdîtin û muzakerê, di cî û wextê hatibû xwestin de, qetlkirina li ser maseya muzakerê, nîşan û delîlek eşkere ya polîtîka dewletê ji bo *"bikaranîna terora dewletê û piştgiriya berdewama çalakiyên terorî"* ye.

Dr. Qasimlo ji bo beşdariya civîna Sosyalîst Enternasyonalê hatibû Ewropayê. Berî salekî, li ser pirsa daxwaziyên Kurda, di navbêra rêvebiriya Îranê û PDKÎ de hevdîtin û muzakere pêk dihatin. Ji ber hişkiya Îranê, hevdîtin û muzakere negihiştibû çi encamê, qut bûbûn. Dîplomatên Îranê ji Qasimlo xwestin ku, hevdîtin *û muzakere di navbêra wan de dest pê bike.* Dr. Qasimlo xwestina wan pejirand. Dîplomatên Îranê, di dema muzakereyan de, di roja duyê de, li ser maseya hevdîtinê, Dr. Qasimlo qetil kirin.

Di dema bûyerê de, du alîkarên Dr. Qasimlo, Dr. Fazil Resûl û Ebdula Qadirî jî bi destê dîplomatên Îranê hatin terorkirin.

**Li ser "*metoda pêkanîna terorê li dijî Dr. Qasimlo*" dîtina we çi ye?**

**Dr. Beşîkçî:** Pir eşkere ye ku, di bûyerê de terora dewletê hatiye bikaranîn. Hikûmeta Awusturyayê, li dijî vê terora dewletê, helwestek ciddî nîşan nedaye, lêpirsîna li ser pirsê bi rêkûpêkî rêve nebiriye, encam bidest nexistiye. Paşê, bûye xwedî helwêstek li gel terora dewletê û parêzvanê terora dewletê.

Di dema îro de, bendên ku têkiliyên navdewletî rêve dibin, ne nirxên mîna mafê mirovan, azadî û wekheviyê ne, bêhtir hêza girseyî, û hişkî ye. Mixabine ku rastiya heye wisa ye. Lê li gel hebûna vê rastiyê jî, tekoşîna ji bo demokrasî û azadiyê jî dê pêş bikeve û raneweste.

**Li ser kesayetiya Dr. Qasimlo dîtina we çiye?**

**Dr. Beşîkçî:** Dr. Qasimlo ronakbîr bû. Aborînasek hêja bû. Li ser pirsên civakî gellek lêkolînên wî hebûn. Li dijî siyaseta Îranê ku li dijî çareseriyan bû, pêwîstiya tekoşîna çekdarî hilbijart. Ev gava wî têra xwe balkêş e, mijarek giring e.

**Rojnamevan Gabar Çiyan**
**hevpeyvîn ji Turkî kiriye Kurdî**

**Lênihêrînek Li Ser Pirsgirêkên Jinên Birîndar Û Goriyên Kîmyabarana Bajarê Serdeştê, Piştî Derbazbûna 21 Salan Ji Vê Bûyerê**

# JİNÊN BİRÎNDAR ÊN SERDEŞTÊ, PÊDİVÎ Bİ ALÎKARİYA DERMANÎ HENE

**Amadekar: Çinûr Qadirî**

Roja 7'ê Pûşpera sala 1366'an a Rojî, weke rojeke tal û nexweş di serpêhatiya xelkê Kurdistana Îranê de bi giştî û nemaze xelkê Serdeştê maye û dê her bimîne. Di vê demê de ku şerekî germ di navbera du rejîmên dijî mirov û dijîkurd de di holê de bû û bajarên Kurdistanê her roj ji aliyê balafirên Îraqê ve dihatin bombarankirin. Di vê rojê de xelkê sivîl û bêtawan ê Serdeştê rastî bûyereke pirr tall hatin, balafirên Beesî bombeyên kêmdeng avêtin ser wan ku bi sedema vê sedan kesan jiyana xwe ji dest dan û dehan hezar kes jî birîndar bûn ku heya niha jî bandora xirab a van birînan li ser laş û ruhê wan maye û hêj birînên wan nehatiye dermankirin û pirsgirêkên wan jî nehatine çareserkirin.

Ewa ku cihê kul û keserê ye, jibîrkirina jinên birîndar di bûyera han de ye ku gellek ji goriyên bûyera Serdeştê jin bûn û mixabin ji aliyê ragihandin û medyayên giştî û bi taybet ên Kurdî hatine jibîrkirin.

Di raporeke wiha kurt de mirov nikare li ser hemû aliyên jiyana wan jinên gorî biaxive û bêguman nirxandina vê mijarê, derfet û demeke zaf dixwaze û divêt ku mirov ji nêzîk ve lêkolînê li ser bike û pirsgirêk û giriftên wan li zimanê wan bi xwe bibihîse, raya giştî ji rewşa xirab û dilêş a wan agahdar bike, lê nebûna azadiyê û etmosfetra serkut û tirs û xofê, rê nade ku xelk û çalakên mafê mirovan li ser wan mijaran lêkolînê bikin. Lê emê bi kurtî qala pirsgirêkên jinên ku bûne goriyê kîmyabarana nemirovane a bajarê Serdeştê, bikin:

Di cinayeta nemirovane a han de, gellek jinan jiyana xwe ji dest da û gellek yên din jî birîndar bûn ku mixabin piştî derbazbûna



çend salan bi ser vê bûyerê, jinên birîndar zarokên nexweş tînin dinê, û kîmyabar anê bandora neyînî li ser wan zarokan jî kiriye.




**Şîrîn Rehîmî**, berpirsa jinên Civata Berevanîkirin ji Mafê Birîndarên Kîmyabarana Serdeştê dibêje: "Di kîmyabarana bajarê Serdeştê de pitir ji 1000 kesan jiyana xwe ji dest da û pitir ji 8000 kes jî birîndar bûn ku ji nîvê pitir ya wan jin bûn".

Bi baweriya wê, %50 ji goriyên kîmyabarana Serdeştê jin û keç in, lê Şîrîn Rehîmî rexnê ji medyayan digire û dibêje ku ew wêneyên ku belav dibin, nikarin derd û azarên wan goriyan bi başî nîşan bidin û di kiryar û piratîk de, pirsgirêkên jinên gorî ên vê cinayetê pirr zêdetir e.

Wê jina çalak sedema vê yekê di medyayan de dibîne ku bi kêmî lênihêrînê li goriyên jin ên bûyera Serdeştê dikin.

**Osman Muzeyen**, berpirsê Komîteya Hiqûqî a Civata Berevanîkirin ji Mafê Birîndarên Kîmyabarana Serdeştê, zirûfa jinên bajarê Serdeştê ku bi sedema bûyera han birîndar bûne, xirab û nebaş dizane û dibêje: "Deverên ku hatin bombebarankirin, mal û xanî bûn, her ji ber vê yekê ye ku pitir ji nîviya goriyan jin û keç in. Ji bilî vê, jinên birîndar bi kêmî derfeta hatin û çûnê ji bo navendên dermankirinê hene û bi vê sedemê asta dermankirina birînên wan hêdî hêdî diçe pêş û eva vê yekê diselimîne ku bandora kîmyabaranê li ser jinên Kurdistanê bêtir bûye".

Li gor zanyariyên ku li bajarê Serdeştê gihîştine destê me, karîna aborî ya gellek malbatan rê nade wan da ku alîkariya jinên birîndar ên kîmyabaranê bikin, di halekê de ku xwedîkirina zarokan û kar û barê navmalê jî di stûya jinên han de ye.

Bi sedema nebûna îmkanat û pêdiviyên dermanî li nexweşxaneyên Serdeştê, jinên birîndar neçar in ku ber bi bajarên weke Tewrêz û Tehranê biçin, ku karîna aborî a piraniya wan di asteke nizim de ye û yên ku bikarin serdana wan cihan bikin, tûşî pirsgirêkên malbatî bi taybet di warê perwerdehiya zarokan de dibin.

Kêmtirîn alîkarî bi jinên birîndar ên kîmyabarana Serdeştê tê kirin, di heyamê çend salên borî de, gellek jin û keçên birîndar yên goriyên kîmyabarana Serdeştê, bi sedema nedermankirin û çaresernekirina birînên wan, jiyana xwe ji dest dane û renge rewşa han her bidome û em şahidê goriyên din jî bin. Jinên Serdeştê pêdivî bi alîkariya bijîşkî û dermanî hene.

Bandora xirab ên kîmyabarana Serdeştê li ser xelkê sivîl yê Serdeştê bi taybetî jin û keçan evqas xurt û berçav e ku di warê civakî de yê bûye sedema pêkhatina gellek arîşe û pirsgirêkan. Gellek ji wan keçên birîndar ên Serdeştê tûşî bêhêvîbûnê hatine û amade nîn in ku jiyana hevbeş pêk bînin û rewşa han dibe sedema tenêbûna wan di jiyanê de û pêkhatina gellek pirsgirêkên civakî û pîskolojîk ji wan re.

Tevî vê çendê ku rejîma Komara Îslamî a Îranê û medya li hember tawana han a nemirovane bêdeng in û weke ku hewce ye derheq ev kiryara nemirovane a rejîma Bees tu pêngav neavêtine û niha jî gellek ji birîndar û goriyên bicîmayî yên vê bûyerê, ji bo selimandina birîn û azarên xwe neçar in ku berdewam serdana Komîsyonên bijîşkî bikin da ku gorîbûna xwe di vê cinayetê de biselimînin. Bi taybet ku gellek jinên Serdeştê rûbirûyê vê pirsgirêkê ne.

Ewane tenê hinek ji pirsgirêk û arîşeyên keç û jinên gorî ên Kîmyabarana Serdeştê bûn ku me qala wan kir, bi hêviya vê yekê ku hemû aliyek pirsgirêk û arîşeyên jinên jibîrkirî ên Serdeştê bêxin berbas û lêkolînê.

www.arsivakurd.org

# Derkirina Duyemîn Cezayê Îdamkirinê Ji Bo Duyemîn Mamostayê Kurd

Piştî derbazbûna du rojan ji pejirandina cezayê îdamkirina Ferzad Kemanger, mamostayê Kurd, Enwer Husên Penahî jî roja şemî 12.07.2008'an, bi cezayê daliqandinê hate mehkûmkirin.



Enwer Husênpenahî, mamostayê akinciyê devera Leylax a Kurdistanê, payîza sala borî bi buxtana "Muharibe"(şer bi Xwedê re) û gavavêtin li dijî ewlehiya neteweyî hate girtin û ji bo girtîgeha îdareya Ewlekarî a bajarê Qurwe hate şandin.

Biryara dadgehê roja yekşem, 13.07.2008'an, hate dan û navhatî ji aliyê dadgehê ve bi cezayê îdamê hatiye mehkûmkirin.

Bi dana biryara han, di dema du rojên borî de li Kurdistanê du mamostayên Kurd, bi cezayê îdamê hatine mehkûmkirin.

# Zeyneb Bayezîdî, Çalaka Mafê Jinan Hate Girtin

Li gor rapora Civata Çalakên Mafê Mirovan li Îranê, roja 09.07.2008'an, **Zeyneb Bayezîdî**, endama Civata han û endama çalak a Civata Jinên Azermêhr ya Kudistanê, li bajarê Mehabadê, ji aliyê hêzên rejîma Komara Îslamî a Îranê ve hate girtin.



Zeyneb Bayezîdî, temen 26 salî, xelkê bajarê Mehabadê û her wiha yek ji endamên Kampayna yek milyon îmzeyan li Mehabadê ye.

Li gor rapora Rêxistina Parastina Mafê Mirovan li Kurdistanê, hêj sedema girtin û cihê ragirtina Bayezîdî, ne rohn e.

Pêka rapora han, ew jina Kurd berê bi buxtana belavkirina nûçeyên nerast, piropagendekirin li dijî rejîma Îranê û bezandina sînor, bi 6 meh cezayê zîndanê bo heyamê 4 salan bi awayê hilawîstî û dûrxistin bo girtîgeha Meraxê hartiye mehkûmkirin.

# Rewşa Kedkarên Kûrexaneyên Urmiyê Dijwartir Bûye

Xwedî karên kûrepêjxaneyên Urmiyê bi hêcetgirtina ji kedkarên girevgirtî, dixwazin tolê li wan hildin û organên leşkerî 4 kesên din ji wan kedkaran bo dana ronkirinên hewce vexwendin.



Li gor nûçeyê "dastranj"ê, Yekîtiya Azad a Kedkarên Îranê îlan kir: "Ji dema bidawîhatina girevgirtina kedkarên kûrepêjxaneyên Urmiyê, rewşa wan ya karkirin û xebitînê ji berê dijwartir bûye.

Karkerên kûrepêjxaneyên Urmiyê di vê dawiyê de, ji bo xuyakirina nerazîbûnê li hember kêmbûna miaş û rewşa nebaş a tendiuristiya cihê kar girev girtin ku di pêvajoya wê girevgirtinê de, nêzîk 26 kes ji kedkarên han hatin girtin û girevgirtina wan bê encam bidawî hat.

Piştî girevgirtinê, netenê rewşa wan baş nebûye, belku xirab û dijwartir bûye.

## Rojeva Civakê

# 14 Milyon Kes Li Îranê Di Bin Hêla Xizaniyê De Dijîn

**Agirî- Beşa Civakî**

Li gor norm û standardên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, kesên ku li cîhanê dangî hêla xizaniyê dijîn, divêt aliyê kêm rojê 2 Dolar dahat hebin. Endamekî Komîsyona Bername û Budce ya Meclîsa Şêwra Îslamî a rejîma Îranê eşkere kir ku 12 milyon kes li Îranê di bin hêla xizaniyê de dijîn û 2 milyon kes jî ji ber enflasyon(awsan)a vê dawiyê di bin hêla xurt û dijwar a xizaniyê de dijîn û jiyana



wan bi gellek tengasiyan re rû bi rû ye. Ji ber ku zêdebûna buhaya xwardemeniyê, malbatên kêmdahat û xizan bi pirsgirêkan re berbirû kirine û nikarin hewcehiyên destpêkî ên jiyana xwe jî dabîn bikin. Bi vî awayî hejmara kesên ku li Îranê di bin hêla xizaniyê de dijîn, 14 milyon kes in.

Xala balkêş di vê derheqê de eva ye ku berpirsiyarên rejîma Komara Îslamî berdewam bi awayên cur bi cur dibêjin hejmara xizan û hejarên ku di bin hêla xizaniyê dijîn, nîvî bûye, bêy vê yekê ku serhejmariyek fermî bidin xuyakirin. Ne diyar e ku berpirsiyarên han van gotinan li ser çi bingehekê dikin.

Serbarê vê çendê ku Îran yek ji welatên zengîn û dewlemend ên cîhanê di warê çavkaniyên binerd e û ji vê rêyê ve dahateke zaf û bêrade dikeve destê hikûmetê, lê em mêze dikin ku rewşa jiyana aborî û civakî ya gelên Îranê dijwartir dibe û roj bi roj hejmara xizanan zêde dibe.

Lê car caran kesên wekî Serwetî, endamê Komîsyona Bername û Budce ya Meclîsa Şewra Îslamî basa rastiyên nava civaka Îranê dikin.

Di Îranê de jî, ew herêmên ku neteweyên ne Fars lê dijîn, zêdetir ketine ber dorpêçên desthilatdarên rejîma Komara Îslamî. Em dibînin ku 4 parêzgehên Kurdistanê, Herêmên Belûç, Ereb û Turkeman, dever û parêzgehên herî xizan di Îranê de ne. Nemaze bajarên Kurdistanê eva 30 sal in ji ber xebat û berxwedana mafxwazane û neteweyî ya Kurdan yê ketine ber pêla baykut û dorpêçên aborî û gelê Kurd di xizanî û belengaziyê de dijî, di halekê de ku gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê hêjayî jiyaneke baştir e.

www.arsivakurd.org

# HÎNDEKARÎ

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Hîndekarî, dozîna mirov a berteka nasîna jiyanê ye û ji dayîkbûna mirov bigirin heta dawiya temenê mirov bi awayekî bênavber û misêwa didome.

Hînekarî, tehna pêdiviya jiyanê ya bivênevê ye. Ev pêdivî tu carî ji mirov nagere û mirov her gav arasteyî lêgerîn, lêpirsîn û dahûrandinên nû û guherbar dike. Gelek rê û rêbazên hîndekariyê û şêwe û şêwazên wê yên nû û nûjen hene. Ji bo wê jî hewcetiya mirov tim bi zanîna perwerdehiyê û derûnnasiya/psîkolojiya hîndekariyê heye.

Pêkhatina hîndekariyê, ligel ku pêyî perwerdehiyê zêde ne pêkan be jî, hîndekarî û perwerdehî ne heman tişt in. Hîndekarî, dozîneya(teoriya) perwerdehiyê û perwerdehî jî sepan û kardariya(pratîka) hîndekariyê ye. Bi vegotineke din, heke hîndekarî tunebe, liv û tevgerên mirov ên ketberê bi rêkûpêk û tevgerên mirov jî têkûz nabin. Her wiha heke perwerdehî jî tunebe, wê çaxê tu fêdeya zanîneke bê çalakî/emel û kardarî nîn e. Ji bo wê, beriya perwerdehiyê pêdivî bi hînbûn û hêwisîna zanîna lebatên mirov û çawaniya liv û tevgerên wî/wê yên erênî heye.

Hîndekarî, deriyê perwerdehiyê yê yekem e. Heta ku mirov tiştekî hîn nebe nikare bi kar bîne. Zanîna bikaranîn û xebitandinê xwe dispêre hîndekariyê. Hîndekarî bi hîndariyên sivik dest pê dike û hêdî hêdî ber bi yên mezintir ve diçe. Bo nimûne tu zarokên berşîr pêşî nikare bi carekê re rabe ser piyan û bimeşe. Hêdî hêdî gavan tavêje. Dikeve û radibe. Ji wan ketin û rabûnên xwe hin tiştan fêr dibe. Her fêrbûnek wekî ceribandinekê dibe hîmê hînbûna wî/wê. Bi rastî axftina zarok jî pêşî bi vî awayî dest pê dike. Ji dê û bavê xwe, ji der û dora xwe hin tiştan dibihîse, dibîne û hîn dibe. Peyre peyre ew bi xwe dike û fêr dibe. Ew fêrbûn û hîndekariya zarok bi kirinên wî re bi dest dikevin û distewin. Ango hîndekarî pêşî bi lasayîkeriyê/texlîtkirinê dest pê dike û peyre jî bi sepandina perwerdehiyê re digihîje armanca xwe. Girêdayî vê mijarê ceribandineke ramanwerê navdar Konfîsyûs heye. Dibêje:

"Ger ku min bihîstibe, ji bîr dikim
Ger ku min ditibe, tê bîra min.
Ger min bi xwe kiribe, ez fêm dikim û tê digihîjim."

Bi rastî jî wisa ye. Heta ku mirov karekî neke û bi destê xwe çêneke ne dikarehîn bibe û ne jî dikare bi kar bîne. Hînbûna herî mayînde bi kirin û sepandinên dîtbar re bi dest dikeve.

Berî jiyanê, tiştê ku liva şopa wê ya guhertinê dimîne, hîndekarî ye. Di encama hînbûnê de, teqez bizaveke ku guhertin tê de dixuye pêk tê. Çawa û çilo dibe bila bibe, di encama hînbûnê de,guhertineke berbiçav a bivênevê derdikeve holê. Piştî hînbûnê, di gel ku tevgereke guhertî ya bi dest xwe re pêk tê, tevgera ku bi vîn û daxwaza mirov re peyre peyre pêk tê jî, derdikeve holê. Liv û bizavên ku pêk tên dibe ku pirê caran ne li gorî dilê mirov bin, Ango ne erênî bin. Ji ber ku ragihandina her mirovekî/ê ya bi civakê re cihê cihê ye. Ji bo ku mirov bikaribe behsa guhertineke mayînde ya tevgerên mirov bike, divê ew guhertin domdar û misêwa be. Guhertina tevgerên demdemî, ji ber ku ji ber mezinbûn, kamilbûn û stewîna cest û hestên mirov pêk tên, tu car wekî hînbûnê nayên dîtin û pejirandin. Çimkî xebitîna hêmanên hundirîn, liv û tevgerên dozîneyî, peyamên genetîk ên rakendiyê(irsîtiyê) ne. Belê hîndekarî piştî jiyanê dest pê dike.

Hînbûnî/hîndekarî karekî takekesî(ferdî) ye. Armanca vê pêvajoyê, her car ji bo domandina jiyanê ye. Vezelokiya vê yekê qet nîn e. Bi vegotineke din, hînbûnî bi van bertekan re pêkan nabe. Arasteyîbûna jîndaran ya ku hemcisnên xwe nas bike an jî wan bişopîne, arastebûneke xwezayî ye. Û ev yek bi destpêka jiyanê re xwe dide der. Ligel ku tevgereke dozîneyî be jî, bi saya hîndekariyê tê venêrtin (kontrolkirin). Belê bi vê berteke re hînbûnî di radeya herî kêm de dimîne.


Pirên wan tevgeran ji hêla der û dor ve tên diyarkirin . Demdemî û guherbar in. Vebijarka (alternatifa) wan a ku tevgerên mirov diguherînin heye. Dozîneyên hînbûna lebatiyê, hînbûna jiyanê jî rave dike.

Hîndekarî ji bo mirov û ji hêla mirov ve pêk tê. Di nav heyînên jîndar de, tenê mirov dikare, vebijarkên jiyanê bineqîne û di navbera sedem û encamê de têkiliyeke erênî raçav bike. Her wiha tenê mirov dikare der barê hevsenga tiştekî de, bi serê xwe biryar bide.

Teorîsyenên lebata vebizaviyê, hînbûnê wekî pêwendiya navbera tiştê hişyarker û lebata vebizaviyê dibînin. Tiştê ku heyberên jîndar dide livandin jî, bûyerên derveyî û hundirîn in. Tiştên hişyarker heyberan dixin nav lebatê. Û ev lebat pêşî bi hîndekariyê dest pê dike û bi perwerdehiyê re encam dide.

Kaniya Helbestan

## ŞEVEREŞÊN SÊWÎ



Xizan Şîlan 2008-01-13 Stockholm

ez
hinavên helbesta kal û pîr
bi şehweta hestên peritî
dadigirim û dinivîsim
li tenetiya şevereşên sêwî
şefaqên ciwaniya min
desteserî bûn
ava kaniya temenê wêran
ber bi rawestgeha
goristana lal ve
diherike
wizîna bayê mirina bêveger
di guhên giyanê min de
dîsa çingeçinge
asîman
li dor keser û nalîna min
dizivire
bêhna bîranînên şad
di xwîna çarenûsa genî de
dixeniqe
bi gavên şemitok û westiyayî
ber bi pêşeroja nediyar ve
dimeşim
li henasa roniya beyanan
bi dengê qebqeba kewan re
lêvên dilê zîzbûyî
dikenînim
ji kovaniya demsalên xwe
bafiroka bêrîkirinên zaroktiyê
difirînim
li xewna şevên spî
rengê tariya rojên bihurî
bi keskesora hêviyan
dixemilînim
li hawara demên reben
sînorên rûreşiyê
ji gerdûna êşa dilê xwe
dişeqînim
li perestgeha çol û beyaran
rêya diçe fazîletê
diramim
di arşîva heyaman de
rûyê rûpelên qurmiçî
ji toza înkara dîrokê
dadiweşînim
û mirovahiyê vedixwenim
nav xezîna nefsbiçûkiya dilê xwe
ez
bi çira awirên tefandî
bi ramanên dil û kezebê
bi dest û piyên ker û lal
û
bi lerza tiliyên bedenê kor
kulîlka xeyalên çilmisî
ji nû ve
dibişkivînim

www.arsivakurd.org

# Mîr Celadet Elî Bedirxan 1893 – 1951

**Konê Reş -Qamişlo**

Gelên xelkê xwe bi mirovên xwe, yên şareze, zane û mêrxas pesin û paye dikin, ewên ku gelên wan sûdek ji wan dîtibe, çi di warê hilgirtina tivingê de be û çi di warê hilgirtina pênûs û xamê de be. Lê gelê kurd di vî warî de jî, weke tev waran, paşketî maye. Diyare ku sedemên vê yekê jî pirr in, wek tev paşketinên gelê Kurd. Qey ev jî Qedera me kurda ye?!

Di 15 vê meha Tîrmehê de (15.07.2008), 57 sal bi ser koçkirina rêberê zimanê kurdî, **Mîr Celadet Bedirxan** re dibuhire, gelo kesî gotiye emê vê rojê bibîr bînin an haziriya xwe û vê rojê kirine?! Tevî ku bêtir ji 10 navendên kulturî û çandî yên kurdan di van 10-15 salên dawî de, hatine dameziran, çi li welat û çi li derveyî welat( sirgûnê). Bêtirî 20-30 kovar û rajnameyên kurdî bi tîpên latînî têne weşandin. Ew tîpên ku Mîr Celadet Bedirxan ji zimanê kurdî re bijartine, piştî xebateke dûr û dirêj, ku 13 salan pêre dom kir û bi wan tîpan hawar û gazî kurdan kir û got:

"**Bavo li dinê ji me kêmtir kes nemaye, heçî milet hene tevde bûne dewlet û hikûmat, xwedan kitêb û dibistan. Bi tenê em miletê kurd bi şûnde mane, reben, feqîr, Nezan, belengaz di destê xelkê de lihîstok…Xelkê hevsarê me kiriye destê xwe li gor kêf û menfieta xwe, berê me ji bakur dide nîvro, ji rojave dide rojhilatê, ji lewra divêt em jî bixebitin, xelkê xwe hînî xwendin û nivîsandinê bikin, vî miletê belengaz ji tariyê xelas bikin, berê wî bidin tav û ronahiyê**".

Mîr Celadet Bedirxan li ser rê û şopa apê xwe (**Mîr Miqdad Medhet Bedirxan**) diliviya, hawar û gaziya wî ji ya apê wî bû. Ew apê ku di roja 22'ê Nîsana 1898'an de, yekemîn Rojnameya kurdî li Qahîrê weşand û di nav kurdan de bibelavkirin daye û di nav rûpelên wê de gazî kurdan kiriye û gotiye:

"**Gelî mîr û axano, kurmancino! qenc bizanin, xwendin, ilm û marifet li dinya û axretê rûyê mirov sipî dike …Niha zaroyên xwe bielîmînin ilm û marifeta. Hûn bi xulaqeta xwe şûcah û cesûrin. Hekê hûn bibin xweyî ilm, hûnê ji dinê hemiya xurttir, dewlemendtir bin**".

Gereke ku ev navendên çandî, kovar û rojnameyên kurdî, liser jiyan û ramanên vî kesî rawestin, nav û nîşanên wî di nav gelê wî de belav bikin, da ku gelê wî ji nêzîk ve wî nas bike, serwextî xebat û berhemên wî bibe, navê wî ji tariya salan bê deranîn ronahîya rojên îro. Bi kêmanî di wiha roj de.. (Mixabin gelek rojên wiha derbas bûne û em ne rawestiyane).

Tiştekî giring heye, pir bîr û baweriya min pê tê, ew jî ev e; yê ku li kevnê xwe ne pirse, lê neguhdar be û neparêze, zore ku karibe di pêşerojan de, tiştekî durist û aktîv ji gelê xwe re pêşkêş bike. Vêca gereke em guhdariyê li vê yekê bikin, li wan mirovên xwe yên kevnar miqateb in û gelê xwe serwextî jiyan û xebata wan bikin. Fermo bi kurtbirî jiyan û xebata Mîr Celadet Bedirxan seh bikin:

Tevî ku mîrê dûmahiya welatê (**Botan**), Mîr Bedirxanê Azîzî, di sirgunê de


li Şamê, di sala 1868'an de çûbû ber rehma Xwedê, lê siltanê Osmanî rê neda kurên wî bi vegera warê bav û kalan "Cizîra Botan", piraniya wan kirin hakim, walî û paşa, lê li dervî welatê wan, da ku ji şer û bela wan xelas be…

Hingê Emîn Alî, bavê mîr Celadet kurk ji wan kuran bû, para wî bû hakimê cezayê li Stenbolê. Di wê demê de, Xwedê kurek dayê, navê wî kir Celadet, ango sebir û saman. Ji ber ku pirr bi hêvî bû ku wê tengayî xelas bibin û rojekê li welatê xwe Botan vegere. Vêca sebir û saman dikişand. lê mixabin, ew hêviyên wî pêre çûne gorê, li cihekî dûrî welatî wî bi gelekî, Misrê, bajarê Qahîre, di sal 1926'an de.

Lê kurê wî Celadet ew hêviyên bavê xwe û bapîrê xwe, bi xwe re hilgirtin û hilanîn û di ber wan de xebitî ta roja dawîn ji temenê xwe. Mîr Celadet bi welatparêzên kurdan re, bi bav, ap, pismam û birayên xwe re komeleyên kurdî yên pêşîn di Stenbolê de ava û saz kirin. Di sala 1914'an de, di eniya Qefqasê de, beşdarî di şerê cîhanî yê yekemîn de kir, ta ku giha Tebrîz û Bako…

Di sala 1919'an de, ew û birayê xwe Dr Kamîran, Ekremê Cemîl Paşa û Fayiq Tewfîq ji Silêmaniyê (Pîremerd), di gel Mêcer Newêl yê Înglîzî, li kurdistana bakur geriyan, daku daxwazên gelê kurd nas bikin, berî ku peyman ( Sîver) bê morkirin di navbera hevalbendan û dewleta Osmanî de. Di sala 1922'an de Mistefa Kemal Paşa fermanek deranî bi kuştin û sirgûnkirina malbata Bedirxaniyan, vêca ji neçarî Turkiye li şûn xwe hiştin û bi şar û welatên dinê ketin, ta ku ew û birayên xwe li Almanya bi cî û war bûn. Bavê wî **Emîn Elî Bedirxan** û birayê wî yê mezin (**Sureya Bedirxan: Dr Bileç Şêrko**) reviyan Misrê, bajare Qahîre. Hingê Mîr Celadet li Almanya xwendina xwe di avûkatiyê de bir serî û dest bi xwendina doktorayê kir. Lê dema ku seh kir şoreşa Şêx Seîdê Pîranî dest pê kiriye, di derhal de xwendina xwe li rexekî hişt û xwe bi şoreşê ve gihand. Mixabin ew şoreş ne di çax û demê xwe de dest pê kiribû û lewra bi hovîtî hat perçiqandin. Mîr Celadet jî, polîpoşman careke din zîvirî Almaniya.

Di sala 1927'an de, Mîr Celadet û Memdûh Selîm Begê Wanlî, bi alîkariya Ermeniyan, komela **Xoybûn** li Lubnanê dameziriyan. Bi beşdarbûna gelek welatparêz û serokên eşîrên mezin di kurdistanê de.




Di sala 1929_1930'an de xwe amade kirin ji şoreşa **Agirî** re, ku ji sînorê Sûriyê êrîşî tirkan bikin û bavêjin ser Mêrdînê, Midyadê, Ûrfa û Cizîrê. Da ku akama artêşa tirkan ji ser şoreşvanên Agirî sivik bibe. Lê sed mixabin wek ku Mîr Celadet û hevalên xwe dixwestin, bi wan re neçû serî. Ji ber ku hingê axa û begên Binxetê xwe-bixwe ji hev nerazî bûn û şerê hev dikirin. Vêca Mîr Celadet ji neçarî xwe bi şoreşa Agirî ve gihand, da ku di şer de li kêleka **Îhsan Nûrî Paşa** û **Îbrahîm Hesko Têlî** be.

Lê sed heyf û mixabin, ew şoreş jî bi destê tirkan, bi tundî hat qurmiçandin. Serokên wê jî, ji neçarî xwe li Îranê girtin û Mîr Celadet Bedirxan di gel wan.

Li Tehranê, Mîr Celadet bi Şah **Riza Pehlewî** re rûnişt û doza alîkariya kurdan lê kir, lê Riza Şah xwe neda ber tu tiştî, tiştê ku xwe da ber, ku Mîr Celadet bi ya wî bike û bibe Wezîrek bi kêfa xwe li dewleteke Ewropî..Lê Mîr

Celadet bi vê tevdîra Riza Pehlewî razî nebû, vêca Pehlewî ew bi darê zorê ji

tixûbên Îranê deranî û berê wî da Îraqê.

Di wî çaxî de li Îraqê, hikumeta Îngilîzî şerê kurdan dikir, dema îngilîzan sehkir ku Mîr Celadet li Bexdayê ye, ketin hev û rêtengî jêre çê kirin, daku ji Îraqê derkeve. Ji ber ku Mîr Celadet Bedirxan di hingê de wek sembolekê bû ji neteweya kurd re. Paşan ji neçarî Mîr Celadet ji Îraqê derket û careke din xwe li Sûriyê girt.

Li Sûriyê jî, hikûmeta firansî ya ku desthilat bû dest danîn ser û ew şandin Şamê da ku di bin rûniştina zorê de be, wek piraniya Kurdperweran di wî çaxî de, wiha mîr jî ket bin rûniştina zorê de li Şamê, digel gelek ji welatparêzên kurdan û serokên êl û malbatên mezin yên sirgûnkirî…

Di sala 1932'an Mîr Celadet bi serokên êl û eşîrên kurdan re, bi şêx, mella û welatparêzan re komelek damezirandin bi navê: Civata alîkari-yê ji bona kurdên belengaz, nemaze ji bona wan kurdên ku ji Turkiyê mişextî û sirgûnî Binxetê bibûn û piraniya wan tazî û birçî bûn. Vêca ji bo alîkariya wan, ev civat hatibû avakirin û gelek malik li şar û gundên Binxetê hatibûn vekirin. Hingê serokê civatê li bajarê Şamê Dr. Ehmed Nafiz Zaza bû û li bajarê Hesekê Hesen axa Haco bû. Ji ber gelek sedeman ew civat jî pûç derket û mîr bê hêvî bû. Mîr, rabû û rêkek nû da ber xwe, ku bi tena xwe kovarekê bi zimanê kurdî tîpên latînî di nav kurdan de biweşîne, bi wê alfabêya latînî ya ku ji sala 1919'an de pê mijûl bibû.. Wiha di roja 15.15.1932'an de hejmara pêşîn ji kovara xwe (Hawar) li Şamê çap kir û di nav kurd û biyanyan de belav kir û hawar û gazî kurdan kir û got:

"**Hawar dengê zanînê ye, zanîn xwenasîne, xwenasîn ji mere riya felat û xweşiyê vedike. Hawara me berê her tiştî heyîna zimanê me dê bide naskirin lewma ku ziman şerta heyînê ya pêşîn e...**)3"

Ew cara pêşîn bû ka alfabêya kurdî latînî berdestî zimanê Kurdî dibe. Digel kovara **Hawar**ê re, di roja 01.04.1942'an de, Mîr Celadet kovareke din bi navê **Ronahî** xurû bi kurdîya latînî çap û belav kir.

Mîr Celadet bi bêtîrî 15 navan di van herdû kovarên xwe de dinivîsand. Ji ber ku kesên nivîskar kêm bûn û ne dixwest ku biyanî zanibin ew tenê, yan ew birayê Xwe (Dr. Kamîran) tev babetên van kovaran dinivîsînin.

Di pey re Mîr Celadet nav di gelek kesan de dida, ew dehif didan ber bi nivîsandina zimanê kurdî. Di roja îro de gelekan ji wan nav û deng dane wek: Cegerxwîn (Mele Şêxmûs), Osman Sebrî, Qedrî Can, Mistefa Ehmed Botî, Hesen Hişyar. Hingê jî, gelek kesên bi nav û deng di kovarên wî de nivîsandine wek:

Goran, Bêkes –Ihsan Nûrî Paşa, Evdulrehmanê Eliyê Ûnis, Mele Ehmed Namî..hwd.

Mîr Celadet di ber herdû kovarên xwe re pirtûkxaneyek vekir bi navê Pirtûkxana Hawarê, û 20 pirtûk çap kirin, dîwana Cegerxwîn a yekemîn:Pirîsk û Pêt yek ji wan e. Hem jî mîr Celadet pêşgotin ji vê dîwana Cegerxwîn re nivîsandiye.

Di sala 1935'an de Mîr Celadet zewicî ye, diyare ku kebanî, kiçmama wî "Rewşen xanim Bedirxan e.

Ji zewaca wan kur û keçek li wan zêde bûye, kur navê wî **Cemşîd** e, di sala 1939'an de çêbûye, doktor bû di bijîşkiyê de, jiyana xwe li Almaniya derbas dikir, di sala 1999'an de li Berazîlê çûye ber dilovaniya Xwedê. lê keç navê wê (**Sînemxan**) e, kebaniya nivîskarê kurd rehmetî**Selah Sadella** ye û niha li Hewlêr dimîne... Mîr Celadet bi van zimanan dizanî: Tirkî, Înglîzî, Fransî, Farisî, Rûsî, Yûnanî, Almanî, Erebî ji bilî ku zimanê kurdî zimanê dê û bavê wî bû, zimanê axaftina mala wî bû.

***Ji berhem û afirandinên Mîr Celadet Bedirxan:***

1- Rêzimana alfabêya kurdî, Şam 1932. ji berhem û afirandinên Mîr Celadet Bedirxan:
2- Rûpelinine alfabê, Şam 1932.
3- Bîyîsa Pêxember. Şam1933.
4- Nevêjên Êzedyan Şam 1933.
5- Nameyek ji Mistefa Kemal Paşa re Şam 1934.
6- Li dordoza Kurdistan ê, Misir 1943.
7- Giramêra kurdî, Şam 1943.
8- Giramêra kurdî-bi firansî
9- Sebebên rastyi ketina edivne
10- Ferhenga kurdî –kurdî
11- Ferhenga kurdî-firansî
12- Xwebinas
13- Kitêba sînemxanê
14- Hevind "şanoye"
15- Dîwanek helbest, çapnebûyî"

Jêder:

1- Mîr Celadet Bedirxan, kovara" Roja Nû " jimar "1" Beyrût, 1943
2- Mîr Miqdad Medhet Bedirxan, rojnameya " Kurdistan" jimar 4"Qahîre 1898.
3- Mîr Celadet Bedirxan, Hawar, jimar 1.Şam 1932.

**Dengê Rojava**

# Yekemîn Salvegera Koçkirina Seydayê Keleş (1930-2007)

**Besam Mistefa**



Mixabin, gelê me mezin û navdarên xwe piştî mirina wan bi rêz û qedir dike, lê ne di jiyana wan de! Van rojan salvegera yekemîn ya koçkirina hozanvanê kurd Seydayê Keleş li Rojavayê Kurdistanê hate lidarxistin. Beriya salekê, di temenê 77 saliya xwe de, di roja 18-06-2007'an de, dilê helbestvanê Kurd yê Rojavayê Kurdistanê Seydayê Keleş li Qamişloyê rawestiya. Navê seyda ê rastî Mele Hisên kurê Mihemmdê Keleş e.

Seydayê Keleş di sala 1930'an de li gundê Bizgûrê ji wîlayeta Mêrdîne li Kurdistana Serxetê(Tirkiyê), hatibû jiyanê. Di 6 saliya temenê xwe de bav û diya wî diçin ber dilovaniya Xwedê, ji feqîrtî Binxet dibe. Weke piraniya hozanvan û şaîrên wê demê di zaroktiya xwe de fêrî xwendina Quran û feqetiyê bûye û piştre berê xwe daye warê wêje û zimanê kurdî û bûye hozanvanekî kilasîk ê kurdan. Keleş hevalê helbestvanê nemir Cegerxwîn, Qedrî Can û Namî, bûye. Xaleke ne ya erênî di jiyana Keleş de ew bûye ku ew derbasî nav tevgera siyasî ya kurdî bûye. Rast e, ev yek ji bandora hizr û ramanên sosyal marksî tê, evên ku cudahiyê di navbera siyaset û çandê de nabînin di qonaxa xebata rizgariya niştimanî de, lê belê ez di wê baweriyê de me ku hozanvan ê tevahiya gel e û ne ê partiyeke taybet e kîjan dibê bila bibe. Hilbet, divê bê gotin ku ev şaşîtî ji dilpakî û kurdperweriya Seydayê Keleş encam daye, vî camêrê ku heta roja dawî ji temenê xwe xizmeta gel û wêjeya kurdî kiriye.

Min careke tenê Seydayê Keleş dîtiye. Min nizanibû ew cara pêşîn û dawîn e ku em hevdû dibînin. Me hinekî behsa cudahiya di navbera helbesta kilasîk û nûjen de kir û wî weke helbestvanekî kilasîk berevaniya wê kir û di dawî de me li hev kir ko helbesta xweş xweş e, çi kilasîk be û çi nûjen. Gellek berhemên Keleş ên çapkirî hene wekî: Em û dijmin- Rêka Gel- Derdê Millet- Ronahî- Xebat- Gotinên Pêşiyan- Helebçe (Yekîtiya Nivîserên Kurd- Duhok ev dîwana wî ya dawî çap kir). Her wisa hin berhemên wî hêj nehatine çapkirin, ji ber kêmderfetiyê wekî: Berbang- Baxistan -Bîranînên Min, ez hêvî dikim ku

kurd xwedî li van berheman derkevin.

Piştî 77 sal jiyan, Keleş li goristana Qudûr Bega li Qamişloyê hate veşartin. Keleş ji bilî helbestê di warê kelepor û folklorê kurdan de jî xwedî bilîmetî û şarezayiyeke berfireh bûye û xwe gellekî westandibû di vî warî de û di encamê de kitêba Gotinên Pêşiyan pêşkêşî xwendevanên kurd kir. Bi giştî, naveroka helbestên Keleş li ser kurdayetî û jiyana hejarî û feqîriyê ne ya ku têde derbas bûye. Mirov tiştekî balkêş di wan de nebîne jî, lê ked û westana xwediyê wan bi aşkerayî dibîne û rîtm û tameke xweş ji wan werdigire. Lê çawa be jî wî - weke gellekê din ku mîna şagirtên Cegerxwînî têne naskirin- tiştek zêdeyî mamostayê xwe pêşkêş nekirin, û nexwestin yan jî nikaribûn ji bin baskê wî şehbazî derkevin! Bi mixabinî dibêjim- ji ber ku divê mirov keda tu kesî winda neke- wî nikaribû xwe bipêşxîne û cudahiyekê yan jî taybetmendiyekê bixe nav helbesta xwe de. Bê guman ev nayê wê wateyê ku seyda ne wefadar ê gel û welatê xwe bû, berevajî vê yekê dilê wî her bi kurd û kurdistanê re bû û ta dawiya temenê xwe ewî xizmeta çanda gelê xwe dikir. Eve jî nimûneyek ji helbesteke Keleş e:

**Zirav û Şêrînê**

Zirav û şêrînê, xweş û hingivînê
Teima wê dimînê sed salî di jînê

Gewra zer û sor e bisk û gulî more
Rihan û bixûre, dev û lêv ji xwînê

Serbestê, ciwanê, jîr û çil zimanê
Ser sera gulanê kuştim bi wê bînê

Ji te dilbirînim, li ser te xemgîn im
Gava te nabînim, li ser hiş namîne

Bejna bilind, taze qirik ji aqaze
Pir tenik û zane, bejna te ya Zînê

Mizgînek dida min, hêjaye zerya min
Heroj dihat ba min, serbest çûm civînê

Wê go ez gul zarim, sêva li ser darim
Xunava êvarim, zanim tu gul bînê

Delalê mêvanî, bi nav û nîşanî
Dermanê min zanî wê ji min re bînê

Mem im, tu Zîna min, derdê birîna min
Ez lê dibûm a min, delalê şêrînê

Wê perdê hilîne, bavê biqetîne
Da tu min bibîne, cîhan û vê jînê

Ez Keleş im, zanim ez bo te derman im
Bi nav û nîşan im, li ser ruwê jînê

Bi zarê xwe bake, wer dilê me şake
Ji bo te pir pake, ji bo te dixwînê.

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat: AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

E - Mail:
agiri2003@hotmail.com
agiri2003@googlemail.com



# Li Îranê Biyara Îdamê Ji Bo 4 Kurdan Hate Birrîn

Hindî ku dem dibore, rewşa mafên mirovan li Kurdistana Îranê dijwartir dibe û zext û givaşên hikûmeta Komara Îslamî bo ser gelê Kurd xurttir dibe. Dadgeha Bilind ya rejîma Komara Îslamî a Îranê, biryara îdama **Ferzad Kemanger, Elî Heyderiyan û Ferhad Vekîlî**, 3 çalakên Kurd ku bi tawana Muharibe ( şer tevî Xwedê) hatin girtin, pejirand. Di vê derbarê de, Ferzad Kemanger ji girtîgehê de peyamek kurt belav kir û got: "Ev biryare ji min re hatiye ragihandin û berpirsiyarên rêveber ên biryarê û girtîgehê ji min xwestine ku daxwaza efûyê bikim, lê min tu gunehek encam nedaye ku daxwaza efûyê bikim".

Herwiha piştî derbazbûna du rojan ji pejirandina cezayê îdamkirina Ferzad Kemanger, mamostayê Kurd, **Enwer Husên Penahî** jî bi cezayê daliqandinê hate mehkûmkirin.



Enwer Husên Penahî



Ferzad Kemanger

Agahiyên berfireh derbarê vê biryarê de rûpela 8'an a vê hejmara Agirî bixwînin.

# Zêdebûna Nifûsa Cîhanê Heta 7 Milyar Kesî



11'ê Tîrmehê Roja Nifûsê ya Cîhanê hatiye binavkirin. Rojek ku ji sala 1989'an şûnde kete nav rojhejmara, da ku cîhan encamên zêdebûna nifûs ji bîr neke.

Niha nifûsa cîhanê 6/4 milyar kes tê texmînkirin, heta 4 salên din, ango sala 2012'an, dê bigihîje 7 milyar kesî. Heke mifahwergirtin ji awayên li dijî pêgiranî û avisbûnê xurt nebin û pêşde neçin, ev hejmare heta sala 2050'an dê bigihîje 12 milyar kesî ku hejmareke gellek zêde ye.

Sindoqa Nifûsê a Neteweyên Yekbûyî di vê derbarê de raporek weşand û destnîşan kir ku her salê 190 milyon jin di cîhanê de evis, ducanî dibin û qasê 50 milyon les jî dest bi jinavbirina zarok di zikê xwe de dikin. Sindoqa Nifûsê a NY da zanîn, eva di halekê ye ku 68 hezar jin di salê de ji ber vê yekê dimirin û ji ber vî karî bi milyonan jin jî siqet û nivîşkan dibin.

## Buhaya Xwardemeniyê Heta Sala 2012'an Dê Her Bilind Bimîne

Banka Cîhanî "WORLD BANK", li ser vê baweriyê ye ku buhaya xwardemeniyê aliyê kêm heta sala 2012'an dê her wisa bilind bimîne.

"Robert Zoellick", Serokê Banka Cîhanî tevî ragihandina vî nûçeyî, zêde kir û got, buhaya vejen (enerjî)ê jî dê her li jor bimîne û renge hinek caran jî kêm û zêde bibe.

Bi gotina wî, buha di beşên xwardemenî û vejenê di astan cîhanî di rewşeke bi xeter de ye.

"Robert Zoellick" got bi sedema berdewambûna buhaya zêde û giran a xwardemeniyê û vejenê, welatên xizan û ne pêşketî bi vî awayê ku Banka Cîhanî texmîn kiriye, ji bo dema han a diyarîkirî, bi qasê 6 milyar dê pêwîstiya wan bi alîkariya salane bona bidestxistina xwarina hewce a xelkê hebe.

# Pêvajoya Aştiya Navbera Felestîn Û Îsraîlê Nêzîk Çareseryê Dibe



Bêtirî rêberên 40 welatên cîhanê ji Ewropa, Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîqayê roja yekşem, 13.07.2008'an li Parîsê û di çarçoveya Konferanseke girîng û mezin li hev civiyan. Bo cara yekemîn, Wezîrên Karê Derve ên Sûriye û Îsraîlê li dora maseyekê li hev civiyan û li hevdu guhdarî kirin.

Di konferanseke çapemeniyê de, Serok Wezîrê Îsraîlê got ku tu demekê bi qasê niha aştiya navbera Îsraîl û Felestîniyan nêzîk çareseriyê nebûye û wiha pêş neketiye. Ew du dixwazin di demeke nêzîk de bi awayekî fermî û rasterast bi hev re gotûbêjan dest pê bikin. Heta niha gotûbêjên navbera wan bi navbeynîkirinaTurkiyê birêve diçin.

Di rojeva siyasî a Rojhilata Navîn de bûyer û sehneyên balkêş tên dîtin û pêşketinên xuya tên berçav. Pêşketinên han ne bi dilê rêberên rejîma desthilatdar a Tehranê ne û herdem hewl daye û dide ku rewşa Rojhilata Navîn aloz û bê serûber be û bona vê yekê jî li mêjdem e dixebite. Fransa kar dike ku Sûriyê ji rejîma Komara Îslamî a Îranê dûr bike û daxwaz ji wî welatî kiriye ku dest ji alîkariyan bi Hizbulhê re berde.

Pispor û karnasên siyasî dibêjin, dê encamên erênî û baş ji Konferansa Parîsê bikevin.

## Dewleta Azerbaycanê Rê Ji Ber Weşana Rojnameya Dîplomatê Girt

Li gor agahiyên ku Berpirsiyarê rojnameya **DÎPLOMAT**'ê birêz Tahir Silêman dan Agirî, ew rojanme ku di Asyaya Navîn û nemaze li Azerbaycanê de tê weşandin, eva qasê du hejmaran e ku dewleta Azerbaycanê rê ji ber weşana wê digire û gellek astengî û tengasî xistine pêşberî weşana wan.

Lê berpirsiyarên vê rojnameyê ji ber hest bi berpirsiyarîkirin li hember çand, ziman û rewşa gelê me, nehiştin Dîplomat ji weşanê bisekine û bi neçarî eva du hejmar in ku di Gorcistanê de diweşînin. Vê yekê jî zext û givaşên malî û mesrefên zaf ên pere xistiye ser milê wan.

DÎPLOMAT, rojnameyek heftane ye ku li Azerbaycanê bi tîpên latînî û Kurmanciya Jorîn weşana xwe dike.